

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎN 2006

40 saliya kurdên Anatoliyê li Swêdê ...



31

“ Amaca min a siftê ku kar bikim, traktorakê bistinim û vegerim welêt... Lê weng nabû, a niha 40 sal in, ez li vir im. ”

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/Ûç ayda bir çîkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 31, havîn-2006

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnîşana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Birnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyat

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln
BIC: DEUTDEBKOE
IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Eşa Dewrêş û Miçe Cemêl, ji gundê Omera

*“ Ez teze hatibûm, her tişt
bi min xerîb dihat!.. ”*

Her nivîskar berpîrsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li
xwedî nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela
Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

NAVEROK / İÇİNDEKİLER



Wêneya berg: Gundê Altitera
Foto: Ahmed Gezer



- 2** Ji Bîrnebûnê / Ali Çiftçi
4 Şênahiya Xelika / Sefoyê Asê
5 40 Saliya Kurdên Anatoliyê li Swêdê / Rohat Alakom
23 Bi Mustafa Topal re sohbetek / Altun Başaran
27 Çêroka kundir / Rebenî Celika
30 Fantazî / Mem Xelikan
33 Folklor
37 Koma Xelikan / Azad Kanîwar
42 Rûkeniya Parseg / Nuh Ateş
44 Tercubeya hevaltiyeke / Stefan Busz
46 Bi Ahmed Gezer re li ser komela gundê Altitera hevpeyivînek
49 Ezê koçkim / Mem Xelikan
50 Nênik, Hezretî Musa, Xaltê Eş / Rebenî Celikan
52 Amerika`dan Kürt Alişan Beyin Torunu, Eraybar / Dr Mikailî
57 İç Toroslar`da Alevi-Kürt Aşiretleri / Mehmet Bayrak
67 Osmanlı`nın Yıkılışından Türk Yunan Şavaşına ...
80 Pevdeng(Diftong) / Amed Tîgrîs



"... ne tenê wazifeyeka şexsî, divê wazifeyeka netewî be!.. "

Bîrnebûnê neh saliya xwe tije kir. Di van neh salan de 30 hejmar derketin. Wek sê cild hatine amadekirin. Liserhev 3 000 rûpel in. Di van rûpelan de, ji folklorê kurdên Anatoliyê hinek nimûne, dîrok, çîrok, yaranî, dîroka goçberiyê û lêkolînên dîroki û ziman hatin belav kirin. Her çiqas kêr be jî, ji mirasa çanda kurdan re hinek çavkanî hatin berhev kirin.

Heta ku ji me hat, me xwest kovarê bigihînin her ciyekî ku kurdên me li wir hene. Lê, em negihîştin vê armanca xwe. Ji ber vê yekê jî hemû hejmarên kovarê em di malpera www.birnebun.com de belav dikin. Ew kesê ku nikare kovarê bi dest xe, dikare bi rêya internetê, bişopîne.

Di van neh salên derbasbûyî de, ji ber rewşa politîk a Tirkîyê, ji aliyê ziman de pêşketineke zêde nebû!

Erê, di nav xwendevanên kurdên Anatoliyê de grûbek însan ku êdî bi kurdî dinivîsînin û dixwînin, heye. Ji bo ku bikaribin vî zimanî biparê-

zin, ne xwedî kuwet û îmkanan in. Piraniya wan li derveyî welêt, li xerîbiyê dimînin. Ji ber vê yekê jî nikarin tesîreke mezin li ser neslê nû bikin. Loma jî ev mirasa çanda kurdên Anatoliyê her li ber windabûyîna ye. Bi windabûyîna vî mîrasê re, em zengîniya çanda xwe jidest didin!

Mîrasa çanda kurdên Anatoliyê tenê dikare bi rêya zimanê xwe bêt parastin. Dema ev ziman têk biçe, bi xwe re dewlemendiya kultura xwe jî têk dibe. Îro em dibînin ku di nav kurdên Anatoliyê de zimanekî jihevdeketî peyda dibe. Yanê hêdî neslê nû, bi vî zimanî nikare danûstendinê bi hev re û bi derûdorê xwe re bike!

Zimanê ku bi sedsalan vir de heta roja îro hatiye bi karanîn, zimanekî zindî, eger em xwedî li dernekevin, dikare bibe zimanekî mirî.

Zimanê latînî li Ewropayê, di dema xwe de zimanekî zindî yê nivîskî bû, îro miriye. Zimanê îbranî heta dawîya sedsala 18an mirî bû.

Lê însanek bi navê Yahuda di dawiya sedsala 18an de, bi serê xwe biryar dide ku ev dê li mala xwe, bi zarokên xwe re, tenê bi zimanê îbranî deng bike. Bi vê biryara yek însanî, îro zimanê îbranî yek ji wan zimanên zindî yê bi kuwet e.

Ji bo ku em bikaribin tehlûka li hember zimanê xwe yê dayikê rakin, tenê rêyek heye li ber me. Ev jî hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê kurdî ye, Ji bo me ne tenê wazifeyeke şexsî, divê wazifeyeke netewî be! Dema em vê ji xwe re bikin wazifeyek, tu kuwet û qudretên ku zora vê biryara me bidin, dê tunebin!.. Divê em vê yeka han baş bizanîbin; eger em bi xwe xwedî ti biryar an xwestina nebin, ne dewleta Tirkîyê û ne jî welatên Ewropayê nayên ji me re nabin alîkar! Berî her tiştî divê em xwedî biryar bin.

Divê em biryar bidin, her li mala xwe bi zarokên xwe, bi derûdora xwe re, tenê bi kurdî deng bikin. Daxweza fêrbûna zimanê xwe û perwerdeya bi zimanê kurdî bo zarokên xwe, hem li welêt û hem jî li derveyî welêt bikin. Heta ew daxwazî ji teref kurdan ve neyê û kurd neynin rojevê, ne dewleta Tirkîyê û ne jî YE nayne rojevê.

Îsal 40 saliya kurdên Anatoliyê li Swêdê ye. Li ser vê birêz Rohat Ala-

kom bi ser nivîsa *40 saliya kurdên Anatoliyê li Swêdê* lêkolênêk bi çend wêneyên kewn amade kiriye.

Dîsan bi vê munasebetê re girêdayî Altun Başaranê, bi Mustafa Topal û xanima wî Ayşe Topal re sohbetek, bi sernivîsa *Bi Mustafa Topal re sohbetek* li ser hatina wan ya Swêdê kiriye. Sohbetek ji pir aliyên ve balkêş e. Pir aloziyên goçberiyê di vê sohbetê de têne rojevê.

Rebenî Celîka ji folklorê kurdên Anatoliyê çîrokek bi navê *Çêroka kundir* berhev kiriye.

Mem Xelîkan dîsan bi hekat û helbestên xwe vê hejmara jî dagirtiyê.

Azad Kanîwar bi sernivîsa *Koma Xelîkan* CD a Koma Xelîkan, a nû şirove dîke û dide nasandin.

Birêz Mehmet Bayrak bi sernivîsa *Îç Toroslar'da Alevî-Kürt Aşiretleri* lêkolîneke bi zimanê tirkî amade kiriye. Li ser eşîrên kurdên alewî agahdariyên nû dide.

Li ser têkçûna dewleta Osmanî bi Heyder Xoce (Haydar Yaşar) re sohbetek bi zimanê tirkî hatiye kirin. Sohbetek ji pir aliyên ve dîrokî ye.

Birêz Amed Tîgrîs *Pevdeng (Dîftong) a kurdî*, gotareke kurt bi çend nimûnan daye nasandin.

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be!

ALİ ÇİFTÇİ

ŞÊNAHÎYA XELIKA



Bi hezaran însan îsal di 23 tebaxê 2006 de şênahîya xelikan şên kirin. Şênahî bi hevkarîya belediyê û komita civanan hat çêkerin. Şênahî di seat 17.00 de destpêkir û heta nivê şevê berdevam kir. Şênahî bi dîroka eşîreta xelika dest pêkir. Dîroka Xelika bi kurdî û bi tirkî, ji aliyê du civanan ve, Selvi İscan û Bülent Uzun hate peşkeş kirin. Di navbaran de şîrên Mem Xelîkan û Seyfi Doğan hatin xwendin.

Serokên Belediyên doralî Xelika, kaymakam, fermandarê karakolê yê

Kuluyê û milletvekiyê parlamentoyê Tirkîyê, Özkan Öksüz di şênahiyê de başdar bûn.

Li şênahiyê Haymanali Zeliha, Fikret Başkale, Kemalê Amedî, Komma Xelikan û çend civanên gund, bi kilamên xwe şênahî şên kirin. Bi sedan xort û keç ketin destên hevdu û heta nivê şevê govend kişandin.

Bi munasebeta şênahiyê bi serkêşiyê Mehmet Demirsoy muzexaneyek heta avakirin.

SEFOYÊ ASÊ





40 Saliya Kurdên Anatoliyê li Swêdê

(1966-2006)

ROHAT ALAKOM

Li derdora salên 1960î li Kurdistana Tirkîyê û Tirkîyê li hemberî xwendekar, ronakbîr û welatparêzên kurdan sîyaseteke zordestiyê dest pê dîke. Piştî van bûyeran êdî îmkana mayînê ji xwendekarên kurd re ku bi taybetî li Îstebolê dixwendin, kêmbû. Di nav wan de hin kes ji Kurdistana Iraqê bûn û li Îstebolê dixwandin. Di sala 1965an de ji wan Cemal Alemdar, Îbrahîm Mamxidir, Seîd Dizeyî, Seîd Evdilrehman tên Swêdê. Di eynî salê de ji Kurdistana Tirkîyê, Bedo Anter jî hatiye Swêdê. Ev cara pêşîn bû ku evqas kurd li Swêdê hebûn, ji sê kesan zêdetir bûn û pêwendî û têkiliyên wan bi hevra hebûn. Di dawiyê de kurd cara pêşîn li Swêdê komeke kurdan pêk tînin.¹

Berê jî du sê kurd hebûn, lê belê di nav xwe de komek pêk neanîbûn, wek Selahaddîn Rastgeldî û Kemal Rastgeldî ku di salên 1947 û 1952an de hatibûne Swêdê ji bo xwendinê.

Di sala 1966an de vê carê çawa emê li jêr jî bibînin qasî 15 kurd ji Anatoliyê, ji derdorê bajarê Qonyayê wek karker tên Swêdê. Piraniya van kesan ji gundên Omera û Celep hatine. Ji gundê Omera: Abdullah Uzunel, Mehmet Topal, Mustafa Topal, Bîlal Harman, Kadîr Çelîk. Ji gundê Celep, Yusuf Ulusoy, Mustafa Sûtçû, Mehmet Suvakci, Mahmud Celep û çend kesên din hatine Swêdê. Mirov dikare bi kurtî bêje ku ji hemû perçeyên Kurdistanê qasî 10, ji Anatoliyê qasî 15 kurdan, bi giştî di navbera salên 1965-1970yî de nêzîkî 25 kurd li Swêdê hebûne.

Kurdên Anatoliyê berî koçberî Swêdê bikin, ji Kurdistanê koçberî Anatoliyê kirine. Koçberî bûye perçekî jîyan û enînivîsa wan. Heta niha çavkaniyên here kevn nîşan didan ku kurd di destpêka salên 1727an de li Anatoliya Navîn peyda bûne. Hin çavkaniyan jî digotin ku kurd di sala 1767an de hatine vê deverê.² Dema Georges Perrot di salên 1850yî de bi mirovên vê deverê re dipeyîve, ew dibêjin ku ev bûye çend nîşan ku li vir dijîn.³ Lê belê hin çavkaniyên nû diyar dikin ku kurdan berî 500 salan li van deverên Anatoliya Navîn gundên xwe çêkirine û ev devaran nas kirine:

1463	Tahrir Defterî:	Gundê Kurdan (Li devera Kizilcahamam)
1466	”	Gundê Kurdan (Li devera Beyşehîr)
1476	”	Gundê Kurdan (Li devera Aksaray)
1584	”	Gundê Kurdan (Li devera Karaman)
1584	”	Gundê Kurdan (Li devera Akşehîr) ⁴

Kurdên Anatoliyê ji Kurdistanê berî bi sedsalan derketine û koçberî Anatoliya Navîn kirine û li wir bi cîh bûne.⁵ Wan, li van devaran bi sedan gundên kurdan ava kirine. Hejmara kurdên Anatoliyê îro ji milyonekî zêdetir e. Hemû bi carekê ve nehatine, dem dem, kom kom hatine. Dema ew hatine, ji wan

re mihacir gotine, lê belê wan ev yeka ji bîr kirine. Sal derbas bûne, vê carê van kurdan jî ji kurdên ku nû hatî re mihacir gotine.

Kurdên vê deverê îro Anatoliya Navîn ji xwe re wek welatê duwem dihesibînin, welatên ewrûpî ji bo wan bûne welatên sêwem. Kurdên Anatoliyê di navbera sê zanavan de mane. Hin kurdên Anatoliyê ji deverên wek Adiyamanê, yên din ji deverên wek Qers û Qerekosê hatine Anatoliyê. Wek mîsal hunermend Fikret Çeşmelî di cîhekî de dibêje ku bavê wî di salên 1920yî de bilûra wî di dêst de wek

şivanekî ji Agiriyê (Qerekosê) hatiye li Anatoliya Navîn cîwar bûye.⁶

Piraniya kurdên Anatoliyê ku min dîtine û pê re peyivîme gotine ku ew cara pêşîn di sala 1966an de hatine Swêdê. Lê belê hin îstîsna hene ku dibêjin kurdên pêşîn di sala 1964 û 1965an de hatine Swêdê. Angorî Fexreddîn Topal bavê wî



Meşa berbi Aftonbladetê (Foto: George Kristiansen)

Mehmed Topal ji gundê Omera, di sala 1964an de⁷ û angorî Fexrî Ulusoy, bavê wî Yusuf Ulosoy ji gundê Celep, di sala 1965an de⁸ hatiye Swêdê. Angorî lêkolereke swêdî, Ingrid Lundberg kurdê ku cara yekem hatiye Swêdê yekî ji gundê Beşkardeş bûye. Ew, navê vî kesî di pirtûka xwe de nade. Ev yeka dîtina hin tirkên ku di van salan de hatine Swêdê ye. Ev kesê ji gundê Beşkardeş cara yekem, di roja 30/9 1966an de di Televîzyona Swêdê, di bernameyeke bi navê Fokus de hatiye nîşandan.⁹ Piştî hin lêpîrsîn û lêkolîna ez fêr bûm ku navê vî kesê ku cara yekem ji

gundê Beşkardeş hatiye Swêdê, Siho Demîrkol e.¹⁰ Ev mîsalan jî nîşan didin ku dema mirov hin tiştan nenivîse û qeyd neke, zû tên ji bîr kirin. Wek li vir jî tê xuyan ev tiştên wiha piçûk, dema xebateke dîrokî tê kirin dikarin bibin babetine giring.

Îro zêdetir ji van herdu gundan kurd hatine Swêdê: Omera û Celep. Ji deverên din jî kurd hatine, lê belê hejmara wan qasî van herdu gundan ewqas zêde nînin. Ji gundên Quluyê yên din û Cîhanbeyliyê jî hin komên kurdan hatine Swêdê. Ne tenê kurdên Qonyayê, kurdên bajarên din ku li Anatoliya Navîn in, ji wan bajarên jî kurdan koçberî



Mehmed Topal (ji çepê), Mustafa Topal ji gundê Omera

Swêdê kirine, wek kurdên li dorberê Ankarayê. Ev herdu gund: Omera û Celep li aliyê rojavaya Gola Xoyê cîh girtine, du gundên cînar dikarin bîn hesabîn. Koçberiya van herdu gundan li serahaliyê gundê Beşkardeş jî bandûra xwe nîşan daye. Ji vî gundî jî çend malbat hatine Swêdê.

Gundê ku îro zêde jê kurd hatine Swêdê bêguman gundê Omera (Omeranlı, Tavşançalî) ye.¹¹ Ji gundê Omera cara pêşîn kesên wek Îdris Bulduk, Mehmed Bulduk, Huseyin Güzel, Abdullah Uzunel, Mehmet Topal, Mustafa Topal, Bilal Harman û Kadir Çelik sala 1966an de tîne Swêdê.¹² Hemû ev kesên tenê,

bi serê xwe hatine Swêdê, malbatên xwe, zar û zêçên xwe paşê anîne.

Ji van kesan Îdris Bulduk di sala 1966an de hatiye Stockholmê û paşê 1969an de çûye li Göteborgê cîwar bûye. Heta sala 1986an di fabrîqeya Volvoyê de kar kiriye. Di sala 1992an de li welêt çûye rehmetê. Çend zarokên wî niha li Göteborgê dimînin. Yek ji kurên wî dengbêj Reşîd e ku di şev û şahiyên kurdan de beşdar dibe. Malbata Reşît bûye babeta pirtûkeke swêdî.¹³

Huseyin Güzel dema di sala 1965an de hatiye, di Volvoyê de kar kiriye. Ew, di sala 1936an de li gundê Omera ji diya xwe bûye. 1972an de malbata xwe jî aniye Swêdê û niha bûye şeş malbat. Huseyin Güzel li taxa Fittjayê dimîne, kar nake, teqawit bûye.¹⁴ Zarokên wî, Hedîye Guzel û Josef Kurdman bi karê sîyaset û çandî ve mijûl dibin.

Yek ji wan kurdên ku ji gundê Omera di sala 1966an de hatiye Swêdê Abdullah Uzunel e. Bi çend hevalên xwe ve teyayî hatiye Stockholmê, piştî çend mehan çûye Göteborgê û li wir di fabrîqeya Volvoyê de dest bi kar kiriye. Çend salan li Göteborgê maye û paşê hatiye Stockholmê, li wir kar kiriye. Angorî îfadeyên Abdullah Uzunel hatina wan ya Swêdê di destpêkê



Foto: Dick Petter

Kurdiska systerarna Shilan och Minge Yasar får blommor av Gunnel Mogård, mång-
chef för invandrarbyrån i Uppsala.

Kurdprötest i Uppsala

Ett tiotal kurder inledde på fredagen en hungerdemonstration i centrala Uppsala. Aktionerna, som ska fortsätta hela nästa vecka, är en protest mot västmakternas uteblivna stöd åt de kurdiska rebellernas kamp mot Sad-

dam Husseins regering i Irak. — Världen måste ingripa mot den nye Hitler, Saddam Hussein, säger Zinar Bira-dost, talesman för Kurdistans förening i Uppsala, den organisation som står bakom aktionen.

Vid fredagens hungeraktion berättade en kurdisk kvinna gråtande att hennes oro för släktingar i Irak alltid varit stor, men aldrig så stor som nu. Hungerdemonstrationen var på fredagen mycket lugn. **Sidan 7**

Şilan û Minge Yaşar du xwişkên ku ji Heymaneyê hatine Swêde û li bajarê Uppsalayê dimînin.

de gelek bi zehmet û dijwar bûye. Ji ber nezanîna ziman û nenaskirina çanda Swêd hertim serêştî û astengî derketine pêşberî wan. Piştî heşt salan êdî karibûye jin û zarokên xwe bîne Swêdê. Angorî Abdullah Uzunel di salên 1960yî de mêr bi serê

xwe hatine û bi salan li Swêdê tenê mane. Anîna jinan hinekî zehmet bûye. Abdullah Uzunel niha teqawit bûye û bi zarokên xwe ve tevayî li taxa Stockholmê ya bi navê Fittja dimîne. Tişteki balkêş Abdullah Uzunel hemû zarokên xwe, du kur

û sê keçik dane xwendinê. Ji wan çend kes li Stockholmê unîversîte qedandine û li vir dest bi kar kirine.¹⁵

Kurdekî din ku ji gundê Omera hatiye Mehmet Topal e. Bi salan di fabriqeya Volvoyê de kar kiriye. Di sala 1996an de wefat kiriye. Xwediyê 9 zarokan bûye. Ji wan pênc heb li Swêdê dijîn. Yek ji wan Fexreddîn Topal. Bi salan e bi karê çekirina pîza ve mijûl e.¹⁶ Yek ji wan kesan e ku cara pêşîn ev branşa li Swêdê di nav kurdên gundê Omera de dest pê kiriye, Fexreddîn Topal e. Nêzikî 10 malbatên Topalan li Swêdê hene.¹⁷

Ji gundê Omera 500 malbat (nêzikî 2500 kes) li Swêdê dijîn. Ji wan dora 400 malbatan (2000 kes) li Stockholmê û 100 malbat jî (500 kes) li bajarên wek Göteborg, Karlstadê û cîhên din dimînin. Çend malbatên gundê Omera ku li Stockholmê dimînin, angorî paşnavên xwe li jêr hatine rêz kirin. Hejmara van malbatan sedî-sed qatî nînin, wek reqemên gulover dikarin bên hesibîn (her reqema li hemberî paşnavan, hejmara malbatan nîşan dide): Aşralı 8, Akçay 8, Aykut 1, Alp13, Bardakçı 5, Bayar 20, Baykal 2, Baysal 20, Bulduk 30, Can 10, Celeb 13, Çiftçi 18, Doşan 21, Ergül 5, Güven 11, Güzel 6, Karakoç 5, Kısa 10, Kızıl 10, Koyuncu 13,

Mercan 6, Önel 6, Sarihan 15, Tarhan 13, Topal 10, Uzunel 6...¹⁸

Çawa tê xuyan ji her malbatekê gelek kes ji vî gundî hatine Swêdê û paşê zarokên wan mezin bûne, ji xwe re malbatên nû pêk anîne.¹⁹

Kurdên gundê Omera ne tenê li Swêdê, li welatên Bakûrê yên din jî dijîn, wek li Danmarkê, Norwêç û Fînlândê. Keçeke kurd bi navê Zahide Bayram çawa tê zanîn di sala 1999an de li Danmarkê wek Bedewa Danîmark (Miss Danmark) hate hilbijartin û navê gundê xwe li hemû Bakûrê da bihistin.²⁰

“Jeg er kurdisk og kommer fra Konya. Men det mesta af familien bor i dag i Danmark og Norge. Så hjemma taler vi både dansk, kurdisk og tyrkisk...”²¹

Navê Zahîdê, Zahîdeke din tîne bîra mirovan, çî tedaduf e ku ew jî berî salan li gundekî Anatoliyê, bedewa gundê xwe hatiye hilbijartin. Navê wê, Zahide Özvîran bûye, mala wan li gundê Sindirîn (Yenice) bûye. Dema ew bedewa Sindirîn (Miss-Sindirîn) hatiye hilbijartin, berxek û zêrek wek xelat dane wê.²²

Gundê duwem ku zêde jê kurd hatine Swêdê, gundê Celep (Sêvka)



*Yusuf Ulusoy
(li milê rastê),
terciman û kesekî din
(1966)*

e. Ji gundê Celebê cara pêşîn wek mîsal Yusuf Ulusoy, Mustafa Sûtçû, Mehmet Suvakci û çend kesên din hatine Swêdê. Yek ji wan kurdê ku di sala 1965an de cara pêşîn ji gundê Celebê hatiye Stockholmê, Yusuf Ulusoy e. Lê belê piştî demekê qezayekê derbas dike û di sala 1967an de diçe rehmetê û cenazeyê wî dibine welêt. Yusuf Ulusoy, li taxa Stockholmê ya bi navê Handenê di

fabrîqeyekê de kar kiriye. Rojekê varîlek jorda tê li serê wî dikeve, wî dikuje. Zarokên wî li Swêdê ne, pênc keç û kurekî wî hene. Kurê wî Fexrî û du keçên wî niha li Uppsalayê dijîn. Dema bavê Fexrî miriye ew du salî bûye û niha salên wî gihîştine 40 î. Jina Yusuf Ulusoy, Elîfe Xanim gelek salan piştî mirina mêrê xwe 1992an de hatiye Swêdê û bi zarokên xwe ve tevayî li Uppsalayê dimîne.²³

Ji malbata Ulusoyan 7 malbat niha li Uppsalayê dijîn. Paşê du birayên Yusuf Ulusoy jî têne Stockholmê. Yek ji wan Ahmed Ulusoy e, navê birayê din jî Hecî Memed e. Ahmed Ulusoy di salên 1970yî de hatiye Swêdê. Ew û xanima xwe bi salan di devera Stockholmê, ya bi navê Vårby Gårdê mane. Ahmed Ulusoy dema hatiye Stockholmê malbatek bûye, paşê ev malbata bûye 11 malbatan. Qasî 26 neviyên wî hene ku hemû li Swêdê hatine dinê. Neviyên neviyê wî jî li Swêdê çêbûne. Ahmed Ulusoy kesekî welatparêz, bilûrvan û xwedî cesaret bûye. Demekê di radyoyê û di filmekî bi navê Beyaz Pantolon (Şalê Sipî) de bi bilûra xwe ve beşdar bûye. Di sala 1976an de Ahmed Ulusoy bi jina xwe Eyşe Xanim û gelek kurdên din ve tevayî li pêşiya rojnameya Aftonbladetê civînekê çêdikin. Wê demê kurdan li dijî Dezgeha Biyanîyan a Dewletê (Invandrarverk) civîneke protestoyê çêkirine. Ahmed Ulusoy û Eyşe Xanim wek mezinên kurdan tevî vê protestoyê bûne. Di nûçeyeke swêdî de Ahmed Ulusoy wek rûspiye kurdan (kurdernas stamäldste) tê nasandin.²⁴ Angorî Ahmed Ulusoy kalkê wî Hecî Memed ji Qersê hatiye Qonyayê. Ew, dîndarekî kurd ê navdar bûye. Ji ber vê yekê navê

wî, li gelek kesên din ên vê malbatê kirine.²⁵ Birayê Ahmed Ulusoy, Hecî Memed jî niha li Uppsalayê dijî. Tenê ji Ulusoyan qasî 100 kes îro li Swêdê dimînin. Berê paşnava Ulusoyan, Goçmen bûye, di sala 1982an de paşnava xwe kirine Ulusoy.

Kurdekî ji gundê Celebê ku di sala 1966an de hatiye Swêdê, Mistefa Sutçu ye. Bi salan li Swêdê kar kiriye. Zarokên wî niha li Stockholm, Göteborg û Karlstadê dimînin. Mistefa Sutçu pêşiyê tê Stockholmê, paşê diçe bajarê Gävle û piştra diçe Göteborgê.

Kurdekî din ku ji gundê Celep di sala 1966an de hatiye Swêdê, Mehmud Celeplî ye. Bi tenê hatiye Swêdê û di gelek karan de xebitiye. Paşê şeş zarokên xwe jî aniye Swêdê. Hêjdeh neviyên wî tenê li Swêdê mezin bûne. Henefî Celeplî ku demekê bûye serekê Federasyona Kurdî kurê wî ye.²⁶ Henefî Celeplî yek ji wan kurdên Anatoliyê ye ku bi salan li Swêdê alîkarî û piştgirtiya kurdên Swêdê kiriye.

Yek ji wan gundên kurdan ku zêdetir mirov jê hatine Swêdê, gundê Gordoxlî ye (Gundê Omê, Zincirlikuyu). Navê vî gundî ji peyva Kurdoglı tê ku bi tirkî tê maneya "kurê kurd". Di çavkanî û lêkolînan kevn de wek Kürtoğlu (Wenzel,

1920) û Kurd Oglu (Loewes, 1927) hatiye nîşandan. Çawa em dibînin di van salan de navê Zincirlikuyu nayê bi kar anin. Di nav gel de ev gunda zêdetir bi navê Gundê Omê hatiye zanîn. Îro nêzîkî 600 kes ji vî gundî li Swêdê dijîn. Ev cara pêşîn ku gundekî kurdên Anatoliyê, komeleyeke xwe li Swêdê saz kiriye: Komeleya Çanda Kurd a Gordoxlî li Swêdê (Gordoglu kurdisk kultur föreningen). Qasî 200 endamên komeleyê hene.

Karkerên ku di van salan de hatine Swêdê, jinên xwe bi xwe re neanîne. Di van salan de anîna jinan wek şermekê hatiye dîtin û tu kesî cesaret nekiriye ku zarokên xwe bibine "welatê gawiran". Derbara vê yekê de gelek serpehatî tên gotin. Carekê dema kurdek diçe welêt, bi dizîka ji jina xwe re dibêje ku: "Keçê tivdarekê xwe bike, ezê vê carê te ji bibime Swêdê. Vê yekê ji tu kesî re nebêje!"²⁷ Lê belê jina wî vê yekê rojtira din ji bavê xwe re dibêje, ji devê xwe direvîne. Bavê wê dema van gotinan dibihîse gelek hêrsa wî tê û li dijî wê yekê derdikeve. Bi kurtî sefera vê malbatê ya ber bi Swêdê vê carê bi serneketiye. Vî karkerê kurd piştî deh salan ancax karibûye jin û zarokên xwe bîne Swêdê. Carekê ji malbatek diçe bal melekî (îmam) û di derbara çûyîna

derveyî welat de ji wî pirsyaran dike. Piştî ku mela dibêje: "Hûn bi jin û zarên xwe ve teyayî dikarin herine welatekî Ewrûpayê, ev yek normal e" ew mala xwe bar dike. Bi vî tehrî problema jinbirinê çareser dibe.²⁸

Yek ji wan jinên ku cara pêşîn hatiye Swêdê û dest bi kar kiriye Esmâ Xanim e. Ew jina Îsa Taşbaş e. Îsa Taşbaş di sala 1966an de bi serê xwe hatiye. Di sala 1970yî de zarokên xwe jî anîne. Îsa Taşbaş û jina wî Esmâ Xanim bi salan di fabrîqeya Volvøyê de kar kirine. Îsa Taşbaş di sala 1993an de dimre, jina wî Esmâ Xanim bi zarokên xwe ve niha li bajarê Göteborgê dimîne. Esmâ Xanim di navbera salên 1970-1980yî de wek karker di fabrîqeya Volvøyê de kar kiriye. Zarokên wê, sê keçik û du kur li Swêdê mezin bûne û kar dikin. Nîyeta wan a vegeerê vê gavê tune ye.

Gelek jinên kurdên Anatoliyê îro li Swêdê wek mamoste, wergervan, politikvan, memur, sekretar, ekonomîst li cîhên cuda dixebitin, wek Hediye Güzel, Altun Başaran, Ayşe Guler, Hatîce Demîrcî û Gurbet Uzunel.

Ji van Hediye Güzel, li Swêdê ulmê polîtîkayê di universîte de xwendiyê û di nav Partiya Çep de wek berpirsa çapemeniyê (pressansvarig) kar dike.

Hin caran di rojnameyan de nivîsên Hediye Güzelê derdikevin.²⁹

Altun Başaran wek wergervan kar dike. Jîyana wê di dawiyê de bûye babeta pirtûkekê. Pirtûka Altun Başaranê bi navê *Sê Jîyanên Altunê* (Altuns tre liv) der çûye.³⁰ Di dawiya pirtûkê de nivîseke dirêj a Annika Thorê heye. Wê di vê nivîsa xwe de bi dût û dirêj qala wê gera xwe ya li gundê Altun Başaranê, Altîlarê kiriye.

Ayşe Güler wek wergervan kar dike. Li gundê Bordelîk (Bogridelik) hatiye dinê û ev bîst sal in li Swêdê dijî. Di sala 2003an de sereketiya filmê Dîdar kiriye ku di Televîzyona Swêdê de hatiye nîşandan. Di vê bermaneyê de jîyana heş jinên kurd hatiye pêşkêş kirin.³¹ Ayşe Güler û Kadîr Çelîk li wan gundên Anatoliyê yên kurd geriyar, bernameyeke bi navê Koçberên Sedsalan amade kirin. Ev cara yekem bû kurdên Anatoliyê bûn babeta filmekî wiha dirêj.³² Ev filma di sala 2004an de di Roj-TV de beş beş hate nîşandan. Jinên wek Hatîce Demîrcî û Gurbet Uzunel bi zarokan re kar dikin.³³

Yek ji wan jinên ku di medyayê wek jineke xebatkar û xebathez hatiye nasandin, Aytên Budakci. Ew ji gundê Celep hatiye Swêdê, li taxa Skärholmenê klînîkeke lazerê

vekiriye. Filmekî dokumenter li ser wê hatiye çêkirin.³⁴ Hin jinên kurd ku li bajarê Uppsalayê dixebitin ji devera Ankarayê hatine. Çawa tê zanîn ji der Qonyayê, kurd her wisa jî li gundên derdorê paytextê Tirkiyê, Ankarayê dijîn.

Aynur Beydoxan li Uppsalayê di nav Partiya Çep de kar dike. Şîlan û Mînge ji devera Haymanayê ne, li Uppsalayê dimînin û li wir kar dikin.³⁵ Ev herdu jî xûşkên Hatîce Yaşar in. Wek tê zanîn Hatîce Yaşar bi salan polîtîkayê ve mijûl bûye û niha li Silêmaniyê, li Kurdistana Başûr dimîne. Babeta jinên kurd ku ji Anatoliya Navîn tên, bi serê xwe hêjayî lêkolînekê ye. Heta niha di vê babetê de kêmtir hatine nivîsîn.³⁶

Her wisa jî rewşa zarokan, duzimanî, sêzimaniya wan bala lêkolînan dikêşîne. Ciwanên kurd îro di navbera çandên cihê de mane û ji xwe re zanavekê (îdentîet) digerin. Di derbarê van babetan de li Swêdê gelek lêkolîn tên kirin. Yek ji wan zarokên kurd, Bulend ji gundê Omera dibêje ku berî hatina xwe ya li Swêdê, wî nizanibûye ku ew kerr e, paşê dema li Swêdê çûye dibistanê, li zarokên din mêze kiriye, wê çaxê fêr bûye ku ew kerr e. Ew, li welêt piştî nexweşîkê kerr dibe. Dema ew hatiye Swêdê dest bi dibistanê kiriye.

Paşê dema ku zimanê nîşankirinê tam hîn bûye, jîyan ji bo Bulend êdî hêsantir û xweştir bûye.³⁷

Gelek ciwanên kurdên Anatoliyê xwestine bên Swêdê, li vir ji xwe re bingehe jîyaneke nû bavêjin. Lê belê hertim ewqas hêsa nîn bûye. Ji bo ku mafê mayîn û karkirinê bi dest bixin gelek caran jîyana xwe xistine telûkê û hin caran jî pereyên mezin dane qaçaxçiyên. Hin kes ji bo li Swêdê bimînin li ser kaxizê bi jin û keçên swêdî re zewicîne.

Di bihara sala 1979an de bûyera ku li Swêdê zêde deng daye bêguman bûyera Îsmet Kesen e. Ev kurdê 17 salî di sala 1978an de bi vîzeyê tê Stockholmê. Îsmet Kesen ji Anatoliya Navîn, ji gundê Celebê hatiye Swêdê. Paşê dest pê dîke li taxa Huddingê diçe dibistanê. Di destpêka sala 1979an de hikûmeta Swêdê biryar digre ku Îsmet Kesen bişîne welatê wî. Lê belê Îsmet Kesen li dijî vê biryarê derdikeve û teslîmî polês nabe. Heval û mamosteyên wî lê xweyî derdikevin, meş, civîn, hevdudîtî û gelek çalakîyên fireh pêk ûnin.³⁸ Îsmet êdî dikeve bin erdê, xwe vedişêre. Di dawiyê de kesekî sosyal demokrat bi navê Roland Morell dixwaze vî xortê kurd ji xwe re wek kur qebûl bike.³⁹ Vê carê ev yeka bala medya Swêdê dikşîne ser xwe.⁴⁰

Piştî demeke dirêj Îsmet Kesen di dawiyê de mafê rûniştinê û karkirinê werdigre.⁴¹ Paşê nav û paşnavê xwe diguhirîne: Cihangir Morell.⁴² Bûyera Îsmet wisa jî bala medya cîhanê kişandiye, wek mîsal rojnameya The Guardian behsa wî dîke:

*"Mr Franck, a leading figure in Amnesty International, is fighting the case of 17-year-old Ismet Kesen a Kurdish boy from Turkey, who has been declared an illegal immigrant. At present he is being hidden by classmates from the Huddinge High School"*⁴³

Nimûneya Îsmet Kesen baş nîşan dide ku hatina kurdan, wergirtina mafê rûniştinê û karkirinê hertim wisa hêsa nîn bûye. Her kurdekî ku hatiye Swêdê di destpêkê de gelek tengasî û dijwarî dîtine. Navê Îsmet Kesen, navê Îsmetekî din ji eynî gundî tîne bîra mirovan; Îsmet Celepli. Berî û piştî kuştina Olof Palme navê Îsmet Celeplî di medya swêdî de gelek derbas bûye. Ew, yek ji wan kesan bû ku cezayê ji belediyên derneketinê dabûne wî. Ew, heta sala 1991an ji wê taxa ku lê dima, derneketiye.⁴⁴ Telefona wî gelek caran hatiye guhdar kirin, polês ew hildaye bin çavan û neheqîyeke mezin lê bûye.

Komeleya kurd ku cara pêşîn tam berî 30 salan li Swêdê ava bûye,

Komeleya Karkeran a Kurdî-Swêdî (Svensk-kurdiska arbetarförening) ye ku bi zimanê rojane her Komeleya Karkerên Kurd hatiye nasîn û di çavkaniyan de jî wisa derbas dibe. Piştî demekê li cîhê peyva kurd, vê carê peyva Kurdistan hatiye danîn û peyva Swêd pêva kirine û navê komeleyê bûye Komeleya Karkerên Kurdistan li Swêd. Ev navguhartinanyan jî tehrêbikaranîna navên cîhê ji bo lêkolera zehmetî û serêşiyên mezin derdixin holê.

Ev komele di sala 1976an de li Stockholmê ji aliyê kurdên Tirkiyê de hatiye saz kirin. Him kurdên ji Kurdistanê û him jî kurdên Anatoliyê cara pêşîn di nav refên vê komeleyê de hatine bal hev û hev nas kirine. Vê komeleyê heta niha jî hebûna xwe berdewam kiriye. Kongra yekem a vê komeleyê di sala 7/11 1976an li taxa Tumbayê çêbûye û 120 kes têda beşdar bûne. Serekê komeleyê yê pêşîn Memo Yetkîn bûye. Paşê heta demeke dirêj Henefî Celeplî serekatîya komeleyê kiriye. Avakarên vê komeleyê yên pêşîn ev kes bûne:

Serek: Memo Yetkîn

Cîhgirê serek: Mahmut Baksî

Sekreter: Henefî Celeplî

Cîhgirê sekreter: Alî Gultekîn

Muhasîp: Ferda Turan

Cîhgirê muhasîp: Fîkret Guler

Seyfî Dogan

Cevdet Demîr

Tevfîk Bal

Ji van 5 kes wek Henefî Celeplî, Fîkret Guler, Seyfî Dogan, Cevdet Demîr û Tevfîk Bal ji kurdên Anatoliyê in. Demamirov li steke fireh a endamên vê komeleyê berçav dike, mirov dibîne ku piraniya endamên komeleyê kurdên Anatoliyê ne. Di vê lîstê de navên 343 endaman bi rêza alfabetîk cîh girtine.⁴⁵

Li taxa Stockholmê ya bi navê Fittjayê îro bi hezaran kurdên Anatoliyê dijîn. Piraniya wan ji gundê Omera tên. Fittja wek paytext û navenda kurdên Anatoliyê tê nasîn.⁴⁶ Wek kurdeke ji vê deverê jî dibêje, kurdên Anatoliyê, Fittja ji xwe re kirine welat û monopola xwe li wir saz kirine.⁴⁷ Li Fittja çend avahiyên bilind hene ku di her avahîkê de qasî 10-15 malbatên kurd dijîn. Wek mîsal ji wan avahiyan, avahîke ku min li wir malbatek zîyaret kiribû, di vê avahiyê de (Forvägen 39) qasî 20 malbatên kurd diman. Li Fittjayê kuça Vårdhusvägen di nav gel de wek kuçeke kurdan tê nasîn.⁴⁸ Li taxa Fittjayê çend qahwe û cîhê

hevdudîtîne yên kurdên Anatoliyê hene. Bi taybetî kurdên salbihurî û teqawit bûne, li wir dicivin, wextê xwe yên vala derbas dikin.

Piştî ku kurdên Anatoliyê derketin derva, li Ewrûpayê bi kurdên ji Kurdistanê hatî ve bûne nas. Ev li Ewrûpayê li pey koka xwe ketin, pey dîrok, ziman û folklorê xwe ketin. Mirov dikare bêje ku kurdên Anatoliyê cara pêşîn nasîya xwe li Swêdê dane xwe û xwe nas kirin. Ev rabûn û hişyarbûna etnîkî, çandî û dîrokî îro jî berdewam e. Dîroka peydabûna wan a etnîkî (etnogenesis) ji bo wan babeta here balkêş e. Dokument, belge û çavkaniyên dîrokî gelek bala wan dikşînin. Ew dixwazin fêr bibin ku ka ew ji ku tîr û çawa, çi wextî hatine Anatoliya Navîn. Ev macera û serpêhatiya wan zêde nehatiye nivîsîn û li derbasî kaxiz nebûye. Çawa tê zanîn li Tirkiyê li ser kurdan zordestîke etnîkî ya bêhempa heye. Haya gelek kurdan ji koka xwe tune. Ev firsend îro li derveyî welat, bi taybetî jî li Swêdê ketiye destê wan. Lékoler Marina Taloyan di xebateke xwe de dibêje ku zanava kurdên Anatoliyê dema hatine Swêdê xurttir bûye. Wek mîsal dema çêkirin û avakirina camîyekê li Fittja kurdan nexwestiye navê wê bibe Turkiska

islamiska moskên. Wan alîkariya xwe ji vê projeyê vekîşandiye, paşê bi komên din ve gotina xwe kirine yek, pozîsyona xwe pêsta birine heta ku navê wê hatiye gihartin.⁴⁹

Di warê pêştaborîna çanda kurdî de serfiraziya here mezin a kurdên Anatoliyê bêguman derxistina kovara Bîrnebûn e. Ev cara pêşîn e ku kurdên vê deverê bi zimanê kurdî weşanekê derdixin. Ev yeka di dîroka wan de tiştêkî teze ye. Bîrnebûn li Stockholmê tê weşandin. Di navbera van salan de (1997-2006) qasî 30 hejmar derketine. Heta niha gelek nimûneyên ziman, folklor, edebiyat û dîroka kurdên Anatoliyê di nav rûpelên vê kovarê de weşiyane. Her wisa jî nivîsên danasînê û lêkolînên cihêreng têda derketine. Bîrnebûnê di warê pêştaborîna çanda kurdên Anatoliyê de roleke mezin lîstîye û dilîze. Di sala 2002an de hejmareke taybetî tenê ji bo kurdên Swêdê û swêdiyan bi zimanê kurdî-swêdî hate weşandin.⁵⁰

Wisa tê xuyan ku kurdên Anatoliyê dixwazin di warê gulvedana çandî û dîrokî de "bahar" a xwe ya teze li Swêdê bijînin. Ne tenê hatina Ewrûpayê û Swêdê, ew wisa jî derketine seyranekê dîrokî, li pey koka xwe ketine û li koka xwe digerin. Ew, berî her tiştî pey bersîva vê pirsê

ketine: “Em ji ku hatine Anatoliya Navîn?” Ev hewldayîna giring ji bo kurdên Anatoliyê proseseke nû ye. Bi kurtî mirov dikare bêje ku kurdên Anatoliyê dixwazin dîroka xwe ji nû ve binivîsin û careke din neyên ji bîr kirin. Belkî jî bona van armancan navên weşanên xwe danîne: Bîrnebûn û Veger.

Kurdên Anatoliyê di sala 2002an de li Stockholmê hatin bal hev û weqfek saz kirin. Navê wê danîn Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn (Stiftelsen av kurder från centrala Anatolien). Çawa em dibînin 36 kesên ji deverên cuda ev weqfa saz kirine.⁵¹ Serekê weqfê Mahmut Baran e ku ji gundê Kuşca hatiye Swêdê. Wî li Swêdê ekonomî û hukuk xwendiyê.

Yek ji van pêşketinên çandî, sazkirina Weşanxana Apecê ye. Ev dezgeha kurd bi navê Weşanxane û Çapxana Apec (Apec tryck och förlag) tê bi nav kirin. Li Swêdê û li Ewrûpa di nav weşanxaneyên kurdî de weşanxana ku heta niha zêde pirtûk çap kirine, weşanxana APEC. Xweyê vê weşanxaneyê jî çawa tê zanîn kurdekî Anatoliya Navîn, Elî Çiftçî ye.⁵² Ne tenê weşanxane, her wisa jî çapxaneke vê weşanxanê heye. Birayê Elî Çiftçî yê mezin Mecît Çiftçî ev

15 salan zêdetir e tek-tenê di nav kaxiz û dengê maşînên ve çapxanê de de jîyana xwe derbas kiriye. Weşanxana Apec di sala 1988an de saz bûye. Heta niha qasî 300 pirtûk ji aliyê Apecê de hatine weşandin.⁵³

Di sala 1998an de vê weşanxaneyê bi şahîke mezin ve dehsaliya xwe pîroz kir. Bona ku Apecê bi rêya wergeran di nav kurdan de alîkariya danasîna edebîyata swêdî kiriye, di sala 1999an de ji aliyê Fonda Nivîskarên Swêdî hate xelat kirin. Fondê 25 hezar kronên swêdî wek xelat daye xweyê çapxaneyê Elî Çiftçî. Bi kurtî mirov dikare bêje ku APEC him ji bo kurdên Kurdistanê û him ji bo kurdên Anatoliyê bûye navendeke çandî li Swêdê.

Di roja 5/4 2003an de li Fittiyayê pêşangehek bi navê Welatê ku roj jê hiltê (Landet där solen skiner) di avahiya nû ya Navenda Pîrçandiyê de vebû. Wê rojê qralîça Swêdê, Sîlvîa jî li wir bû. Qralîçe hat li pêşangeha kurdên Anatoliyê geriya û ji berpirsan agahî di derbara kurdan de wergirt. Bi keçên kurdan ve sûret kişand û hin organên medyayê cîh dane vê hevdudîtina qralîçê û kurdan. Bi minasebeta vê pêşangehê hin kar û xeberên din jî hatin bi dar xistin. Hin kom û hunermendên ve deverê di van çalakiyan de beşdar

bûn, wek Şan Atçî. Hunermend Şan Atçî wek komîker hatiye nasîn. Ew li taxa Stockholmê ya bi navê Flemningsberg mezin bûye, piraniya henek û laqirdiyên wî li ser malbata wî û ahaliyê vê taxê ye. Malbata wî ji gundê Celep hatiye Swêdê. Wek komîker zêdetir rewşa kurdên Swêdê, gund û malbata xwe pêşkêşî temaşevanan dike.⁵⁴

Mirov dikare bêje ku ev cara yekem bû ku kurdên Anatoliyê bi awayekî fireh dihatin nasîn. Di pêşangehê de gelek hacet, tişt û wêneyên ji vê deverê hatin nîşandan. Pêşangeh heta mehekê vekirî ma (heta 18/5 2003). Ev çend sal in ji bo danasîna çanda kurdên Anatoliyê, di navbera Navenda Pirçandiyê û kovara Bîrnebûn de hevkarîkê dest pê kiriye. Di çarçeva vê havkariyê de di sala 2002an de ji bo jinên kurd qurseke hînbûna zimîn amade bûye û vê qursê çend periyodan dewam kir. Mamostetiya vê qursê Ekrem Altun kiriye.

Îro bi deh hezaran kurdên Anatoliyê li Swêdê dijîn. Heyranîke mezin di nav wan de ji bo Swêdê heye. Wek nivîskarê swêdî Jan Guillou jî dibêje, nifûsê Quliyê ku zivistana 10 hezar e, havînan dema “swêdî” tên bi kêmanî duqat dibe. Li vî bajarî Meydana Olof Palme,

Kuşa Olof Palme û loqinteyên bi navê Swêd hene.⁵⁵ Ev best û beriyên Anatoliya Navîn, havînan dibe Swêdeke piçûk. Dema kurdên ji welatên cihê yên Bakûrê (Swêd, Danmark, Norweç, Finland) havînan tên û tevî kesên ku ji welatên mayin (Almanya, Fransa, Îngiltere, Hollanda) hatine dibin, wê demê Qulî û gundên derdorê wê dibe meydana şahî û dîlanan. Havînan zimanên cihê cihê ji aliyê keç û xortên kurd ve tên deng kirin. Pirçandîke rengîn li Anatoliyê xwe nîşan dide. Bi kurtî zivistan û havînan demografiya kurdên Anatoliyê nabe yek, diguhure û havînan rengîn dibe.

Bi taybetî kurdên Anatoliyê piraniya sermaye xwe li welêt radizînin û li gelek deverên Anatoliya Navîn xaniyên modern ên wek vîla tên ava kirin. Malên wiha gelek bi luks bi taybetî li gundên Omera û Celepê hatine çêkirin. Karkerên kurd havînan diçin welêt, tetîlên xwe li van çolên Anatoliyê yên zerîn derbas dikin. Jîyana li ser erdê bav û kalên xwe ji deryayê (behr) tercîh dikin. Gelek kes van xaniyên tezeçikirî û nûjen wek “havîngeh” bi kar tînin. Zivistanan kes di van xaniyan de namîne, deriyên wan kilît dikin, careke din vedigerin Swêdê. Lêkolerek van xaniyan wek xaniyên

demderbaskirinê yên permanenet⁵⁶ û yekî din malên xalî bi nav dike.⁵⁷ Li kêleka wan hin malên piçûk ji bo qerewil û parastvanan hatine çêkirin. Ew kesan ji Kurdistanê, ji ber zordestiyên û belengaziyê berî 10-15 salan hatine vê deverê cîwar bûne. Gelek ji wan ji bajarê Mêrdînê ne yan jî wisa tîne bi nav kirin. Di havîna sala 2004an de di navbera ahaliyê van gundan û kesên li van gundan dixebitin hin

dubendî û nakokî derketin, hin kes ji herdu aliyan birîndar bûn.⁵⁸

Di nav van 40 salan de di jîyana kurdên Anatoliya Navîn ku li Swêdê dimînin gelek guhartinên aborî, çandî û civakî pêk hatin. Zarok û ciwanên ku li Swêdê mezin dibin xwe wek nîv-swêdî dihesibînin. Swêd ji xwe re wek welatekî duwem qebûl kirine. Rengên şîn û zer (rengên ala swêdî) hukimî jîyan, pêşeroj û enînivîsa wan dikin.

Jêrenot:

- 1 Di payîza sala 2006an de pirtûkeke min wê bi navê Kurdên Swêdê (1965-2005) di nav weşanên Serkland de derkeve.
- 2 Rohat Alakom, *Orta Anadolu Kürt Literatürüne Bir Katkı*, Bîrnebûn, nr 8/1999.
- 3 Georges Perrot, *Kurdên Haymanayê*, Apec, 2000, rûp.30.
- 4 Rohat Alakom, *Orta Anadolu Kürtleri, 2004*, İstanbul, rûp.34.
- 5 Rohat Alakom, *Orta Anadolu Kürt Literatürüne Bir Katkı*, Bîrnebûn, nr 8/1999.
- 6 Anders Hammarlund, *Yeni Sesler-Nya stämmor: En väg till musiken i det turkiska Sverige*, 1993, rûp.85.
- 7 "De första åren i Sverige var kämpiga", Avisen 26/4 1999.
- 8 Bi Fexrî Ulusoy re hevpeyvîn, 17/1 2001, Uppsala.
- 9 Ingrid Lundberg, Kulubor i Stockholm, Stiftelsen Sveriges Invandrarinstitut och Museum i Botkyrka, Stockholm, 1991, rûp.31, 57.
- 10 Bi Mehmed Bulduk re hevpeyvîn, 17/7 2005, Stockholm. (Mehmed Bulduk ji gundê Beşkardeş e û niha li Stockholmê dimîne).

- 11 Dara Şıran, *Kurder i Centrala Anatolien*, Maj 1981, Tvåbetygsuppsats.
- 12 Altun Başaran, *Bi Kadir Çelik re hevpeyvîn*. Bîrnebûn, nr 16/2002.
Altun Başaran, *Bi Bilal Harman re hevpeyvîn*. Bîrnebûn, nr 16/2002.
- 13 Margareta Brinde / Inger Morris, *Bland kvinnor i Turkiet*. SIL. 1893.
- 14 Bi Josef Kurdman re hevpeyvîn, 2/4 2002, Vårby Gård.
- 15 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn, 14/1 2001, Stockholm.
- 16 "De första åren i Sverige var kämpiga", *Avisen* 26/4 1999.
- 17 Bi Fexrettin Topal re hevpeyvîn, 9/4 2002, Stockholm.
- 18 Ev reqemên gulover berî çend salan bi saya agahiyên Omer Sarhan,
Mustafa Sarhan û Bekir Uzunel hatine tespit kirin ku hersê jî ji gundê
Omera ne û bi salan in li Swêdê dijîn.
- 19 Celal Semiz, *Yurduşındaki İşçilerin Türkiye'de Kalan Bireyleri ve Sorunları*
(Tavşançalı Orneği), Selçuk Üniversitesi.
- 20 Danmarks smukkeste! Zapp-Jorden Rundt, nr 2/200.
- 21 *En pige med stor Miss-forståelse*, *Westegnen* 24/11 1999.
- 22 Müslüm Yücel, *Tuz Gölü Kürtleri, I-VIII*, Yeni Gündem, 2000, İstanbul.
- 23 Bi Fexrî Ulusoy re hevpeyvîn, 17/1 2001, Uppsala.
- 24 "Hjälp oss - Vi lever i skräck", *Aftonbladet* 20/3 1976.
- 25 Bi Ahmed Ulusoy re hevpeyvîn, 24/11 2000, Stockholm.
- 26 Bi Heneî Celeplî re hevpeyvîn, 6/11 2000, Stockholm.
- 27 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn, 14/1 2001, Stockholm.
- 28 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn, 14/1 2001, Stockholm.
- 29 Hediye Guzel, *Invandrare med examen ej önskvärda*, *Metro* 3/2 2000.
Hediye Guzel, *Fadimes kamp för kvinnors rätt*, *Metro* 26/1 2002.
- 30 Altun Basaran & Anikka Thor, *Altuns tre liv-Från Anatolien till Alby*,
Bonniers, 2004.
- 31 Ayşe Guler, *Veger*, nr 7/2004.
- 32 *Koçberiya Sedsalan*, Bîrnebûn, nr 25/2004.
- 33 Bi Gurbet Uzunel re hevpeyvîn, Bîrnebûn, nr 20/2004.
- 34 *Entreprenören Ayten Budakci driver en laserklinik för kvinnor*,
Aftonbladet 13/5 2005.
- 35 Kurdprotest i Uppsala, *Uppsala Nya Tidning* 6/4 19991.
- 36 B. Uzunel / M. Sarhan, *Utbildningsbehovet hos kurdiska kvinnor och
ungdomar i Botkyrka*, *Botkyrka Kommun*, 1987. Oscar Pripp, *Kulturbundna
attityder och anpassningar till bostadsmiljön - En boendeundersökning
bland turkar och kurder i Fittja*, *Byggnadsnämndens R5.1990*. Abdullah
Dogan, *Massmedia och invandrare*, APEC, 1997. Abdullah Dogan, *Kurdiska
tonårsflickor*, Edsburk, 1998.
- 37 Louise Danielsson, *Ung och döv i mångfaldens Sverige*, *Mångkulturellt
centrum*, 1994, rûp. 23.
- 38 *Kamraterna gömmer Ismet undan polisen*, *Aftonbladet* 23/2 1979.

- 39 *Politiker vill adoptera Ismet*, Aftonbladet 2/3 1979.
- 40 Första mötet: *Ismet och hans nya pappa*, Aftonbladet 8/3 1979.
- 41 *Ismet leder anti-rasistisk rörelse*, Aftonbladet 3/5 1979
- 42 *Ismets första sommarlov*, Vecko Revyn, nr 29/1979.
- 43 "Wiking" groups breed racism in Sweden, The Guardian 21/3 1979.
- 44 Joakim Nergelius, *Konstitutionellt rättighetskydd - Svensk rätt i ett komparativt perspektiv*, 1996.
- 45 Kopyake vê listeyê di arşîva nivîskar de ye.
- 46 *Många kurder i Fittja*, Metro 5/3 2001.
- 47 *Fittja, världen och vardagen*. Red. Ingrid Ramberg & Oscar Pripp, Mångkulturellt centrum, 2002.
- 48 Bi Ali Koç re hevpeyvîn, 22/12 2000, Stockholm.
- 49 Marina Taloyan, *Kurdiska familjer i Sverige: En studie av familjemönster bland kurder från centrala Anatolien, Turkiet*, Høstterminen 2004, Uppsats för magisterkurs, Stockholm Universitet. Etnologiska Institutionen, rûp.16.
- 50 Bîrnebûn, nr 16/2002.
- 51 Harun Coşar, Ali Çiftçi, Akif Özdemir, Ahmet Tarhan, Mustafa Kara, Nuri Kara, Ziya Güler, Zafer Güler, Kaplan Keskin, İhsan Eken, İsmet Aktaş, Mecit Çifci. Yusuf Özden, Ali Yağcı, Hacı Mustafa Çelik, M. Yusuf Güler, Raşit Karakuyu, Metin Güler, Hamit Atmaca, Mahmut Arıkan, İbrahim Yıldırım, Ömer Sarıhan, Mahmut Baran, Kerim Yıldırım, Engin Yıldırım, Yusuf Yıldız, Hayrettin Tümtürk, Mehmet Kesmez, Süleyman Köksal, Ali Coşar, Hacı Baysal, Mehmet Bal, Hikmet Altas, Kemal Yıldırım, Seyfi Doğan, Şükrü Çilek.
- 52 Karin Levander, *Ali sprider kurdiska böcker i Sverige och svenska böcker i Kurdistan*, Sesam, nr 46/2000.
- 53 Jean-Cladue Hussais, *Europas största kurdiska förlag ligger på Spångavägen*, Karavan, nr 1/2000.
- 54 Fem frågor till Shan Atçi (stå upp-komiker), Svartvitt, nr 4/2002.
- 55 Jan Guillou, *Vad kostar invandrarna?* (En bilaga om invandring av Jan Guillou), Aftonbladet, januari 1996.
- 56 Bülent Kaya, *Sevgileri Boşaltılmış Evler*, Ürün Yayınları. 2002.
- 57 Oscar Pripp, *Kulturbundna attityder och anpassningar till bostadsmiljön - En boendeundersökning bland turkar och kurder i Fittja*, R5: 1990, rûp.79.
- 58 *Taşançalı'da Tedirginlik*, Evrensel 4/8 2004.

Bi Mustafa Topal re sohbetek

Mustafa Topal (Miçe Cemêl) 40 Sali di berve hat Swêdê.

ALTUN BAŞARAN

*Apo, tu dikarî xwe bo me bidî nas-
kirin, Hûn cima ji 5000 km heta
vira, hatin. Cima Swêd?*

– Navê min Mustafa Topal e. Ez
ji gundê Omera, di sala 1966 an
de hatime Swedê. Di ber me 7
kes hatibûn. Huseyin Güzel, Hanifi
Kaya, Yakup Bulduk, Ahmet Bulduk.
İsmet Sütçü. İsmet ji Celebê, havalê
min î eskerê bû. Ew heft meha
berî me hatibûn. Rojekê ji min re
mektubek şand, got; were. Li vê
vextê telefon mina niha tunebûn.
Ez teze ji eskerê hatibûm. Karê min
şoforî, cotkarî û şivanî bû. Dema
ku ez hatim, 36 salî bûm. Bavê du
zara bûm.

28ê hezîrana 1966an de, bi tîrenê
hatim Stockholmê. Ez cara siftê li
tîrenê niştim. Cara sifte ji gundê xwe
derketim. Xelkê digot; ê we sabûn
kin. Li Tirkîyê, em ditirsandin. Li
İstanbulê, em li tîrenê sivarbûn heta
Swêdê, sê roj û sê şev ajot. Bi şîva em

giheştên sentrala Stockholmê. Min qe
tu navê Swêdê û zimanê swêdî berê
nebihîstibû!. Min digot qey: ew jî yan
bi tirkî an jî bi kurdî deng dikine.

Em li êvarakê li Stockholmê 24
kes ji gundê Omera, Celebê, Cûtka
û gundê Omê peya bûn. Yekî ji me
Swêdî nedizanî. Xortekî tirk hat, ji
me re tercumanî kir.

Armanca we ya hatina Swêdê ci bû?

– Em ji bo ekonomiyê hatibûn. Em
li hotêlekê, heftekî man î. Perê me
hewqes têrê kir!.. Dura em li der
manî. Em li kendala, tunelbana û li
ser sandelya raketinî.

Me ziman nedizanî, kar dîtîn
zahmet bû. Karê min ê siftê li
restaorangeka li Alvikê bû. Nezanîna
zimên pir zahmet bû. Ji min re digot-
tin: fîncana wîne min kevcî tînan.
Digotin; zerkê wîne min dicû tiştêkî
din tîna. Heta deh meha min ziman
hu nekir. Deh meha karê restaorangê

kir. Dura cûm Göteborgê, şeş sala li Volvovê kar kir. Me bi desta li ber xwe dida. Li wir jî ziman tunebû. Bi desta îşaret dikirin.

Piştî sê sala min îzna xwe ya siftê kir. Du meha li iznê mam. Heta heşt sala weng devam kir. Birayê min Memet Topal jî li vir bû. Birayê min piştî heşt sala şiva wegerî welêt. Bi tenê li vir mayîn bi min qar dihat!.. Ez wê salê çûm, sê meha li gund mam.

Amaca min a siftê ku kar bikim, traktorakê bistînim û vegerim welêt... Lê weng nabû, a niha 40 sal in, ez li vir im.

– Me hertim kar dikir. Sosyal yardimî, cî bû, me qet nedizani! Li sala 1974an min jin û zaroyên xwe anîn. Min hêdî zani ku ez narim Turkiyê. Vextak aila min hat, xaniyê min tunabû. Em li cem hevala diman. Em dehe kes di malekê de dimanî. Mala min a siftê li Fruengenê bû. Dura hatim Fittjê. Amaca min a siftê ku kar bikim, traktorakê bistînim û vegerim welêt... Lê weng nabu, a niha 40 sal in, ez li vir im. A niha şeş zarê min hene. Li vir mezin bûne. Ji bo wan em şeş miha li vir in û şeş meha jî li wir in. Car car difikirim xaskak ez nehatama, herkî meriv bi

nav salan de tere merî ji vir aciz dibê! Heşê min ên niha yê hîngê bûna, min zarê xwe netînane vira. Ez xwe li Omera hîn rihet dibînim!.. Eger zarê min li vir tunevîna qet nedihatim vira!...

Apo, van çel salana çî dan te û çî yê te birin? Rindîya xwe çî bû û xerawîya xwe çî bû?

– Rindîya xwe, pere dan me. Xerawîya xwe jî namus li dest me girtin!

Ayşe Topal Jina Mistafa

– Berî ku ez bême, bavê min ditirsiya û ji min re digot; ew ê te biwe li wir cîbile!. Ev tîrsa hertim li ser min hebû. Jibo vê jî bavê min heft edres dane min, eger tişteke hate serî min ku ez li van edresana bigerim. Em hatin Swêdê, Wextaka em siftê hatin, li mala Huseyîn, çavê min li xanima Huseyîn ket, îşik bi ber çavên min ket!..

Ez teze hatibûm, her tişt bi min xerîb dihat!..

15 rojan em li mala Huseyîn Güzel man. Dema ku em hîn li mala Hüseyîn Guzel bûnî, Hasan Cetinkaya ji gunde Altîlerê, hat cem me, aliyê me kir. Ji me re xanî derxistin û kêmasiyên me tedarîk kir.



Eşa Dewrêş û Miçe Cemêl, ji gundê Omera

Foto: Altun Başaran

Ez bi salan bi tenê bûm. Digirîyam. Min digot qey ez li serê çiyakî me. Min ji Micê re digot; va derê weng çî ye, te çîma em hûnanî!

Dura min îşê paqijîyê li Âhlensê û PUBê dît. Hêdî vira bi min rind dihat.

Ziman nezanîn pir zahmet bû. Ji bo hertiştekî me pir zahmetî dikişand. Xwerina me hertim mirîşk bû. Me goşt nedixwar, li herdê me, me digot; qey xinzir e. Carekê me xwest mirîşkekê bistînin. Me nav nedizanî, me digot: dê û bavê hêka! Dîsan carekê bi şaşîtî me xwarina

pisika sitendibû. Dema Micê xwar, got; tama vê çîma tirş e? me yî meze kir, resmê pisika li ser e.

Di sala 1982an de li muzexaneyê etnografî, cara sifê tewna kurdên Anatoliyê hatibû dagirtin. Resmekî te li ba kiralîça Swêdê, Silviya hatibû belav kirin. Me ev resimê te yê bi Silviya re li sergîya Kurdên Anatoliya Navîn, di sala 2003an de li Fittjê, nişan da. Di vekirina pêşengehê(sergî) de dîsan kiralîça Swêdê hatibû. Me ev resmê te û kiralîçe di vê pêşengehê de mezin kiribû û li

dîwer lidarxistibû. Du dikarî ji me ra qala wê bike?

– Me li muzexanê tewneka mîna yê gundê me dagirt. Ew nemazlixeke xalînê bû. Min bi jinkê Remzî Omê ve nemazlix dikir. Eşê Şêxê jî bedenî dikir. Rojekê 500 kes dihate ziyareta me. Her yekî dihat dorek tê da dîtina. Yek ji wana jî kiralîçe bû. Hat di ser me ra sekînî, mêz kir û got; dapîra min jî weng tewn dikir! Fotogirafciya sifetên me bi kiralîçê re kişandin.

32 sal in ez li vir im. Tabî bi sikintiya darbas bûn. Me zarê xwe mezin kirin, bi mal kirin. Li walêt xanê çêkirin. A niha em ê emeklî ne. Tevahev kal û pîr divine. Ez hatim,

tenê, malek bû. A niha li heşt mala 34 torinê me hene.

Televîsyon cara sifte li vir min dit. Hevala min jina Huseyin Guzel, rojeka di televîzyonê de paşê Swêdê, Olof Palme derkatiye. Çûye li ber televîzyonê runiştîye û derdê xwe ji Olof Palmê re weng gotiye; vi me re yardım ke!.. Fahm nekiriye ku ev bi kurdî nizane.

Farka niha û hingê; xwarina me li vir tune bû. Zebze, meyve û nanê me tunebû. Niha hertişt heye. Qimeta me mîna berê tune. Berê pirseka me dibû alîyê me dikirin. Me edresek nizanibîya, em heta wê edresê dibirin. Lê niha serê xwe helnaynin, li te mêznakin.



SÊ CILDÊN KOVARÊ DERKETINE.

Navnîşanên li jêr hûn dikarin sparişa xwe bidin.

Navnîşana li Swêdê
Apec Förlag
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

Navnîşana li Almanyayê
Muzaffer Özgür/Birnebin
Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

E-post
info@birnebin.com
Internet
www.birnebin.com

Çêroka kundir

REBENÎ CELIKAN

Çi hêbûye çi tune bûye. Li gundekî, mêrek û jinek hêbûne. Vana ji zû va, zewicî bûne, lê kurikê xwe tune bûne. Jinik bi mêrikî xwe va, sewê vê yekê pir bi ber xwe diketine. Her ro li ber Xwûdê digerîyane, digotine; -Xwûdê! dergûşekî bi me de, qe ku nebe ma kundirek be.

Rokê ji royan Xwûdê libergerîna wana bihîstîye. Bi emrê Xwûdê jinik bi paşil (Bi ducanan) maye. Çend wextan bi Şiva dergûşa jinikê xwûdê dayîye ku va kundirekî bi pelcîkê zer e.

Mêrik bi jinikê va, bi vê yekê eceb mane. Kundir helnane dînane koşê hodê. Di ser ra çend wext derbas bûne. Dîsa rokê ji royan deng bi ser kundir ketîye. Kundir bi gurpinîye qelîştîye, jê keçikeke por zer bi der ketiye. Mêrik bi jinikê va ku çav li vê keçîkê por zer û rind ketine, keçîk hemêz kirine,

pê şabûne. Bîstîkê bi şûn da keçîk li wana hatîye zimên, gotîye;

-Dê û bavo, çend temehê min li we hêne. Yek, eza her şevîkê ji qalîkî xwe derêm, werim ba we, lê hûn ji kesî ra qalê min mekin. Didû, Her ku ro helat hûnê qalîkî min sê cara av din. Sisê, Kê ez xwastim, min bidîne wî û ewî ku ez birime ma rê (Royê) sê cara qalîkî min av da. Ezê ji heft sala bi şiva ji qalîkî xwe xelas bim û hûnê hingê qalîkî min bişewitînin.

Keçîkê wer got bi şiva, çûye ketîye kundir û qalik li ser xwe girtine. Êdin keçîk her şevîkê ji kundir bi der diketîye, dê û bavê wê bi wê dilîhistine, pê şadibûne û keçîk devdevê siwê dîsa diçûye, diketêye kundir û qalik li ser xwe digirtine.

Çend wext veng derbas bûne û rokê ji royan kundir tûlit bûye hatîye li ber dayîkê xwe sekinîye, keçîkê têda bang kirîye, gotîye;

–Dê, ezê îro herim ser çem, ji te ra kincan bişom. Dayikê gotîyê;

–Keçika min tû yê di kundir da yî, tu yê çing kincan bişoyî? Keçikê gotîyê;

–Tû têrê biavê ser kerê. Hêlika têrê kincan têka, hêlika têrê ji kundirî min têke. Eza herim kincan bişom werim.

Dayikê qe hîna nekirîye ku keçikê di kundir da, ya here jêra kincan bişo, lê dilê keçikê neşikênaye, çûye têr avêtîye ser kerê. Kincê gemarî kirine hêlika têrê, kundir jî kirîye hêlê din. Ker bi rê ketîye.

Ker hatîye kêlekê çem. Kundir jê helpêkiye, vebîye, keçik jê bi der ketîye, dest pê kirîye kincê gemarî gî şustine û li ber royê rêxistine. Heta ku kinc zîha dibin keçikê jî xwe tazî kirîye, ketîye çem, serê xwe di çem da şuştîye. Keçik pê nehesîye; wextê ku wê di çem da serê xwe dişuştîye telehek ji porî wê yê zer bi avê cêm va çûye. Keçikê serê xwe şuşt bi şiva, rabîye kincê ku zîha bûyî berhev kirine û kirîne têrê kerê, bi xwe jî ketîye kundirî xwe. Kundir jî firîye ketîye axzê din yê têrê û ker bi rê ketîye hatîye mal.

Kundir ku çûyê mal bi şiva, li qirarekî din yê cêm lawikê axeyekî pir mezin, hespa xwe tî bîye, hatîye ser çem ku hespê av de. Heta ku

hesp avê vedixwe lawik jî jê peya bîye, dest û rûyê xwe bi avê cêm dişuştîye û, mehes kirîye tişteki dinav avê çem da dibirqê ku çavê merîya yê ji ber diqerimine. Lêwik destê xwe avêtîye ku va telehek porê zer e. Lêwik di dilî xwe da gotîye;

– Va çi telehe ku mîna rê (Royê) dibirîqê? Ecew xwûdanê vê telehê çi xezal ê?

Li hespê xwe sîwar bîye, di qirarê cêm ra ajotîye ku bibîne ka va telehê porî kê ye ku bi ber avê çem ketiye. Lêwik wê rokê heta êvarê bi hespê li der û dorê çem gerîye, lê kesek li ser nedîye.

Lawikê êxe dora din yê royê rabîye, çûyê gundê li der û dora çem gîştika gerîye, pirsîye ku;

–Kî roka ber wê çû ser çem, kinc yan serê xwe şuşt?

Lê kesekî wê rokê çûyî ser çem nedîye. Tehr paşîye lawkê êxe hatîye gundî Kundirê, pirsîye ku roka ber wê qe kes neçû ser çem kinc yan serê xwe neşuşt? Pîrejînekê gotîye;

– Dihû di ber malê me ra kerek derbas bû ber ve çem çû lê tu sîwar li ser tune bû. Ji wê bîtir jî min kesekî çûyî ser çem nedî. Lêwik gotîye;

–Ker, kera kê bû?

Pîrê mala dê û bavê Kundirê bi wî mêrandîye. Lawik hatîye ber

malê Kunderê. Ji dayikê Kunderê pirs kirîye, gotîye;

– Xaltê! yê ku dihu çûyî ser çêm kinc şuştinî, keçika te bû?

Dayikê Kunderê ku, kunderê ew temeh kiri bû ji kesî ra qalê we neke, gotîye;

–Lawê min tu keçikê me tune ne. Kunderêkî me hê ye. Yê ku dihu çûyî ser çêm kinc şuştinî kundera me bû.

Lêwik zanîye ku di vê yekê da tiştêk hêye, xatirê xwe xwastîye, çûye. Lawik çûye ba dê û bavê xwe hal-hekata xwe ji wana ra qal kirîye, gotîye;

–Herin wê kunderê ji min ra bixwazin. Dê û bav lê eceb mane, li ber dayîne, di ser dayîne lê lêwik dev ji yê xwe bernedaye, gotîye;

– Hutil -mutil, hûnê vê Kunderê ji min ra bixwazin.

Dê û bav neçar rabûne, çûne mala kunderê, li ser darê xwezginîyê runîştine, bi emrê Xwûdê Kunder ji lawikî xwe ra xwastine. Dê û bavê Kunderên ku, kunderê ji berê da temeh kiribûn ku kê ew xwast, ewê

wê bidine wî, şor pir dirêj nekirine, kunder dayine lawikî êxe.

Wana ku Kunderê helnine bibine. Dê û bavê Kunderên lawikê êxe temeh kirine, gotine:

–Tu yê heft sala her ku ro helat wê sê cara av bidî ku ma qalikê xwe zîha nebin. Heft sala bi şiva keçikekî por zer ya ji kunder bi derê, tu yê hînganê qalikê kunderê bişewitînî.

Lawikî êxe mîna yê wana gotî kirîye, heft sala her ku ro helat ew sê cara av daye. Heft sala bi şiva qalikê Kunder qeliştîye. Jê keçikekî por zer, mîna royê li ezmên dibirqe bi der ketîye. Lawikê êxe hema qalikê kunderê avêtine nav êr şewitandine. Dê û bavê Lêwik ku çav bi vê keçikê rind ketinî şa bûne. Êxe hema emr dayîye xulam û xizmetkaran dawet û şenayîyekî heft ro heft şeva ajotî bi dar xistîye. Keçik bi lawikî êxe va bûne bûk û zava, mêr û jinê hev û heta paşîyê umrê xwe di nav kêf û muhbetê da jîyane.

Çêroka min çû rast, min xwar sinîk mast.

FANTAZÎ

MEM XELÎKAN

Pîlot; gundîyekî me yî democrat wû. Bi gotinên vî, qominîstê gundî yekemîn wû. Wek her gundîyekî, wê wextê ew jî xizan û di tuneyê de wû. Bi xortên gunde wê wextê li dibistanên bilind dixwandin re digeriya û bi wana re radibû û rûdinişt. Wana xortana jî ew mezineke dizanîn û qîmeteke mezin jî didane Pîlot. Zatî jî weng bû. Bi sohbet û fanteziyên xwe, cemeet kêfxwaş dikir. Li hîlbijartina 1965 a, TÎP Pîlot li gund danasandin û ji TÎPê re rey berhevkin. Hostekî însaetayî baş û şoferê biçera wû. Ji bo wê, jêre Pîlot digotin. Rehmetî yî tat wû. Ew tatiya vî wexta fanteziyên xwe katdikirin, xwaşiyek din didane wan fanteziyan. Min, dilheyê di vê nivîsê de çend fanteziyên vî bi we re parvakim.

Pîlot digot; “Eemê zevîyan diçinî. Eezî, li seser biçera şêxî

Elî Axame. Bîbîçer şikest. Miminî mêskir, perçeyekî pipirî muhim (girîng) şikestîyê. Didizanime ew perça, lili Titirkîyê ne mumkun e were diyînê. Mimin, ji şêxê rerehmetî re a ku hatî serê me erkir. Rerehmetî, got; Pipilot, ji te bêtir kes ji bin vîvî karî nêder ê. Kaka tu çi dikî, bike. Meme ji vê belengazîyê xilaske û biçerê birêkê. Bibi seer vê gotinêde, ez rabûm çûm AAAnkerê. Lili teyyarê Lolondrê sîyar bûm. Çûçûm Îngilterê. Mimin, siftê perçeyêk bi me geger stand. Dûdûva, min bibi xwe û xwe got; eez hetanî viira hatime, eez tenakê li Londra'yê bigerim. Eez, dere nava bajêr ketim. Kuku ezî raste bîbineke mezin hatim. Mimin zanî, eew meclisa wanayê. Keketim hundir, mimin dît li ser derîyekî, LOLORDLAR QEMERASI' nivisandiyê. (Kî dizane, diwe ku

Îngilizan wê wextê bi zimanê Tirkan deng dikirin.) Mimin, deri jihev kir û mimin got tû û ez biderketim.” ,Emê, Qominîstin a’.

Bihîst-sih salî berê, li dinê wek huro mineqêşa ,got û go’ UFO, hene tunene dibû. Ew mineqêşa, li gundê me jî dibû. Hena digot; „UFO, ji kuda hatine? Dinêne din hene? Wana giştik derew in.“ Hena jî digotin „Na, jiyana li dinê tenê tune. Li Rojgêrana (Gezegen) jî jiyana heyê“. Pîlot; ,Wewer mewên. Çiçima UUFO tunene. Jiji xêr vê dinê, Lili hen rojgerên didin jî, jjiyana heyê. Hihim jî, yêna lili wir dijîn; têne bi UUFO ya, Memeriyên li dinê zekî û hişgêştî direvînin diwine wiwira. Lili ser mêjo yêna wana hûrniherîna(inceleme) çêçêdikin. Ûû ku ji bo xwe ji wana fafaydê bigirin. Çeçend meha ber vê, eezî li nava terlawûm. Titişteki mîna sêla, qilot û didibiriqî, ji eezmanade dakete seser min. Mimin xwe avite kortekê û min xwe bibizoorê xilaskir“.

Li qezaya me, rojekê Pilot raste mitingêke Demirel tê. Dû mitingê ve vedigere gund. Gundê behsa mitingê dikine. Kî dibêjê miting baş wû, kî dibêje na nebaş wû. Pîlot; “Wewe Nazmiye xanim dî? Fîfistanekî sorî lê wû. (Sorî nîşana çepitîyê.) Mimin xwast herim cem wê, çeçend pirsê jê bipirsim. Lêlê

parêzgeran(koruma) ez bernedam. Mimin bi brûyên xwe lili hewa nivisand û mimin got; ew fistanî sosor fikira te yê an na?.Gogot; „Erê fikira mimine.“

Ezî telebe wûm. Ji bo tatîla Sibate emê li gund wûnî. Ez û hevlekî mamoste li ber qehwê em raste Pîlot hatinî. Pilot, gilîyên xwe kirin. Got „Ezi li we sîvahatime. Hûn qet li min napirsêne û nêna mala min.“ Hevalî mamoste jî got; „Pilot, mala te li der gunde û dizanî berfe-zivistane, Him jî ê diwêna kuçikê te heyê. Kesi nêzikê mala te nakê. Emê çing werinî mala te?“ Pîlot „kukuçikî min nayê dewrimci ya(şoreşger).“ Bi ser wê gotinê de, bi êvarê ez, hevalê mamoste û hevlekî din em rabûn çûn mala Pîlot. Em sed-sedûpence metro nêzikî malê bûn kûçik xwe berda me. Kûçik kîjanî ji me bigire î vî bixwê. Welhasil me xwe bi zorê avite hundirê malê. Hevalê mamoste xûlî bû, bi dengêki bilind got; „Ka Pîlot te got kûçikî min nayê dewrimciya?“ Pîlot; „Eerê, wenge lê dinav we de bêbênamûsek heyê.“ Hevalê me bi xwe re birî nîşan da. „vava bê namûsayî lili nava gund bibi zare min dikê“ got.

Li ber camî ya gund cemeet berhev bûyê sohbet dikirin. Qala gundîyekî me yî, ji gund biderketi û li bajêr pir qelew (dewlemend) bûyî dikirin. Pîlot „Mimin ji berêde

dizanî waya yê pir qelew bibiwe. Wawayaya yî kurik wû pipirî qirik gir wû. Mimin rokê li ber dûdûkana bange vî kir. Mimin got ez ji te re guşiyek titiri bisitînim guguhê vê kekerê geske. Gogot “Dudu guşiya bistîne, Ezê boçê kerê jî gegeskim”. Ji wîngê va min zazanî vaya yê bi tutuçarekî mezin be. Pîlot, li gund du hevale vî yên mamoste hewûn. Ji bo dewrimci û demoqrati ya


wana gelek bawerîya vî hebû. Wana hevalana yekî motosiklet, yekî ji 124 Murat otomobilek standi wû. Pîlot li nava gund ji xorta re propagande dikir, digot „wawana xwe firotin Eemerîqa yê. Wewexta Emerîqa yê bibi bawila jiji min re Dodolar anîn, min bi pîpînê di bêwil hihildaç“

Pîlotê rehmetî, wana fanteziyên xwaş ji me re cihîştin. Xwedê rehma xwe li vî ke.

SELAHATTIN BULUT, ji qeza Dêrikê ya Mêrdinê ye. Li Dêrikê û Qersê mamostetî kiriye. Ji ber xebatên xwe yên polîtîk di sala 1981ê de hatiye girtin.

Yek ji wan xebatkarên zimanê kurdî ye ku bi salan di rewşên herî dijwar de, her ji bo belavkirina kitêb û kovarên kurdî xebitiye. Xwediyê Kitêbxaneya Medyayê, li Stenbolê ye. Di bihara îsal de bi navê *Bihuşta Lal* berhemeka hêja bi zimanê kurdî daye weşandin. Weşanxana Avestayê ev berhema bi çapeka delal weşandiye.

Bihuşta Lal ji deh kuteçîrok û bîranînan pêk hatiye. Bi zimanekî



zelal, beriya cunta eskerî ya 1980î xweş aniye zimên.

Bi hêviya serkeftin û berhemên nû em birêz Selahattin Bulut pîroz dikin.

Redeksiyona kovara Bîrnûnê

KLAMA HEVÊDÎ

Klama Hevêdî klameke kevn e û nêzika 60 salî di ber vê ji aliyê Fata Hesên va hatiye stranê. Navê Hevêdî yê heq Hesên e (Hesênê Husîn: Hasan Ateş). Hevêdî ji Xelika (Karacadağ-Kulu-Konya)) ye û li gorê ku tê qalkirin merivekî li ser xwe bûye. Ew li mehîneke xam û xulî sîyar bûye û bi mehîne va tevhev ketiye korteke li pêş malê Herşîd. Hevêdî ji parsî û kezewê da kûr birindar dibe û bi vê birinê di 33 saliya xwe da dimre.

Fata Hesên ji Xelikê jêrî (Dondırma–Cihanbeyli) ji malê Bêzêd e, ya ku xizmê malê Herşîd e.

Di klamê da navê cih û warên li Kurdistanê, wekî “deşta Herranê” derbas dibin. Bi vê, meriv têdigihê ku berê jinên şare navên cih û warên Kurdistanê yên pê wan nas, kirine klamên xwe. Bi vê rê jî, meriv dikane ku di derheqa koka Kurdên Anatolîyê da haydarîya bi dest xe. Loma berehevkin û weşandina klamên kevn ji vê hêlê da ji kareki bi kêr e.

Dilê min deşta Herranê
ketiyê lingê min strîyê balanê
Mistefa xêr û gûnîyê min li stûyê te
resmî bavî Zexê û Nuhê
mîna resmî Uskî Memo têke camekanê
Gulê Hese Lalê ne dayka xwe ye
Ku rokê heft cara here ser tîrbê
Ku bibê Hevêdî bi ser te da

Têne dilopê berf û baranê
Dilê min çîyayê leglegê
Berfekê li min daye avtiye êtege
Uskî Memo sîyarekî sifik e
Hevêdîyê Husîn rênçberekî neyme ye
Ye bi pîyekî hezar yarim genim bavê olçegê
Mistefa qurban bê lawî lawî lawê mêra
Kezewê di devî Hevêdîyê Husîn da kezewa şêra
Mistefa perê çar kerîya li kekî xwe bide
Paşê rawe bê keko qezencê li pî cêmêra
Dilê min mîyêke li ber bêrên e
Şîrî firûh ji gên e
Ninê û Rehmê kwîr bin
Malê kekî pir ji çira
Ku li xwe nena qeda xwedêne
Mistefa hevşî Elî Bêzê bi rê ke
Here tomafîlekî wûne
Bavî Zexê û Nuhê têke
Wextê ku tuxtur got çare tune
Birinê xwe yê li kezewê
Dîlîmekî ji yê xwangê korocax heyne têke
Bejna kekî min dara bî ye
Min çirpîyêke xwe jê birîye
Kekî min î bi yara bukînî û dergûşa çelinî ye
Navê kekî mîn î heq Hesen e
Ji şîrînî navê ku bavî min lênayê Hevêdî ye

Şareya klamê: **Fata Hesen**

Gotin: **Mirca Hecê**

Nivîsvan: **Nuh Ateş**

Kilama şîna

Ji ro helat heta ro ava
Sêvrikê xwe da bendê safî
Kuleka eşkersîzî li Hecoyî Xoce derketiye
Bavê Nevzatî min mir ji nişkava
Koma min ji îşê gêvir hat bi berbankê xwe va
Uçaxa gêver bişevite, hamal birin
Her kendalekî da hen lê peyakirin
Keçîk lavîka terka dê û bava kirin
Ar vi mala gêvir keve,
xweng û bira ji hev sar kirin
Kurkê xal û mata hevdi nasnekirin
Gîştîka keçîk û lavîk li vir venda kirin
Bişevite Avrupa şevitî, çiçesa bi biha ye
Hajê ne ne ku qova sovê gêrbû bi ser da
Ê ditirsîne xwev nakeva çava heta birbangê
Ki çûçîk xwe tavêne ber pencerê

Gotin: Lalê Elî

Berhevkar: Altun Başaran

Kilama şivên

Min go barke barke şivan barke
Ker cibîne hesp timarke
Bana kuçkî Qerebêş ke
Yarê mezin vê ra yalke
Yarê biçûk li xwe marke
De min go şivani ye, şivani ye
Kiwa here timî bêli ye
Kolavî ji panzde hokayî li ser pi ye
Îş û gucê xwe tim rezilî ye
Min go pezê şivênî areng kirî
Li daviya mala mexel kirî
Lolo mere xwe li ba hevala mepesine
Ka nişanak te bi min va kirî
Da here lo lo, lo şivano, yar biçûk î, dil nezano
Serî yarê li binî nigano
Min go pezê şivênî ji peyiz de ji yarê ra bi carez gûz da
Lolo mere xwe mepesine
Kanê sozak te ve min da
De here lo lo, lo şivano yar biçuk î dil nezano
De min go şivani ye sivanî ye kova here timî beli ye
Kolavî ji panzde hokayî li ser pi ye
Îş gucê xwe razilî ye

Gotin: Lalê Elî

Berhevkar: Altun Başaran

KOMA XELÎKAN

AZAD KANÎWAR

Cih û warê Kurdên Anatoliya Navîn, bi axîn û bi kul û derd e, bi gotina rast axa wê bi nalîn û fixan e. Wê çi sûrgûnî û çi malwêranî, wê çi êş û jan dîtîn. Ger ku mirov erdê wê bikole wê hesreteke bi çendî çiya tê de bibîne. Ango, hesreta welatê bav û kalan, hesreta bîranînên li paş mayî, hesreta zarokatîyê an jî xewn û xeyalên zozanên rengîn.

Li vê dinyayê tişteki zor heye ku navê wê xerîbî ye. Xerîbî dûrketin e, ji xwe û ji hebûna xwe veqetîn e. Kurd, ne dûrî vê yekê ne. Li der û dora me mînakên bi vî rengî bi hezaran e. Gava ku yek diçe xerîbiyê, ango ji gundê xwe, ji mala xwe dûr dikeve, êdî ew kesa bi nivî ye, çavê wî li welat e, dilê wî li ser kolanên

gundî wî ye. Êdî dinya ji bo wî bê tahm e, di nava girseya mirovan de ew bi tenê ye û hewl dide ku xwe ji zû de bigihîne cihê ku lê hatiyê dinyayê. Her yek ji me dibe ku hestên bi vî rengî hîskiribe. Ji ber şert û mercên aborî, xwendinê û hwd sedem çi dibin bila bibin, li vir hest û hîskirin yek e.

Ji bo kesekî xerîbî, tê wateya dilwêranî û qehr kişanê. Di gelek helbest û strana de ew hêmana xerîbiyê cihê girîng digire. Kilam û stranên herêma me pir caran bi vê hêmanê (îmge) hatine dagirtin. Carna hesreta dê û bava, carna ya zar û zêça û carna jî ya evîn û evîndarê... Lê belê ji bo gelekê, ji bo mîleteki xerîbî, tê wateyeke din. Êdî navê wê ne xerîbî ye, ew ne çûyîneke demane û ne jî gereke bi veger e... Divê



navekî din li wê were kirin. Divê bi têtîhên din ên cûda were vegotin. Xerîbî qels û lawaz dimîne!

Bi gotina navdar em bibêjin, ew dîaspora ye. Rêwîtiyeke bêdawî û ber bi dilmatiyê ve. Dema ku kesek diçe xerîbî, ji bilî awarteyan ew dizane ku ew ê dîsa vegere, çavî wî li rê ye, riya wî vekirî ye. Lê ji bo mîletekî rewş ne bi vî rengî ye, di çarenûsê de labîrenteke xedar hatiye nivîsandin. Veqetîn, di ferhenga wî mîletî de mirin e. Tunebûneke bêdeng û wendabûneke bênav e. Êdî rê û pirên veqerîne hatine rakirin, keştiyên rêwîtiyê hatine

Jiyan û çanda Kurdên Anatoliya Navîn, di destpêkê de li ser ax û li bin ezmanekî wisa tê dirûvandin. Bêgûman, bi van rêzikên kin, hal û rewş bi awayekî têtîjî nayê ziman. Mebesta min jî ne ew e. Ew mijara lêkolînên cihêreng û romanên dirêj

e. Lê bi kurtasî ya ku dixwazim bibêjim, herêma me di nava hesreke dîrokî de dijî. Ew hesreta di çanda wê de, di wêjeya wê ya devkî de û di mûzîka wê de bi awayekî berbiçav tê xuyakirin.


Bi taybetî mûzîka Kurdên Anatoliya Navîn, behreke wisa ye ku bi hest û ramaneke çavlipaş û sûrgûnî hatiye honandin. Di stranan de xemdarî û bendewarî cihêkî girîng digirin. Serhewayên me, ango kîlamên me yen li ser êş û janekê hatine gotin, mirov dizane ku ji kezebê tîn. Dilşewateke ku dila dişewitine tê de heye. Her weha wexta ku mirov guhê xwe bide straneke bi rîtm, ango straneke govendê jî, ew ê bi rehetî tê derxîne ku di kûrahiya newa û gotinan de dilşikestin û dilşewateke mezin heye.

Her çiqas jenerasyonên sedsalên dawîn li ser welat anînzimaneke rasterast nekirine jî, ew vê rasteqîniyê naguherîne. Çand û huner di rojekê de ava nabin. Çand û hunera Kurdên Anatoliya Navîn, ne berhema dused salan e. Di hevîrê wê de bax û bexçeyên Mezopotamya, çiya û baniyên Kurdistan, qêrîn û hawara sûrgûnî vesartiye.

Bi van gotinan ez dixwazim we-

rim ser komeke mûzîkê ya Kurdên Anatolîyê: Koma Xelîkan û albûma wan a dawîn a li ser navê “Nalîn”. Ji ber ku gava ku min li albûmê guhdarî kir, ew hest û ramanên ku min xwestî li jor bînim ziman, li min peyda bûn û der û dora min hewş kirin. Navê albûmê “Nalîn” e. Ji navê wê jî diyar e, bi dîtîna û ramana min tevahiya naveroka wê dinale! Nalîna Kurdên Anatoliya Navîn a dîrokî, bi stîleke afrînerî û bi xemleke hemdemî bi vê albûmê tê ziman. Ne wek mûzîkjen an jî rexnemend, lê wek guhdarekî bi dilnizmiyeke sade, ez dixwazim li ser vê xebata nû çend tiştan bibêjim.

Ew çend sal in di warê mûzîkê de pêşketineke hêjayî gotinê heye. Li hêla şiyarbûn û zanebûna neteweyî, pêşveçûnên teknolojîkî û deskeftinên qanûnî jî, rê li ber vê yekê vedikin. Ji nemir Kürt Remzî vir de mûzîka Kurdên Anatoliya Navîn, êdî li der û dora xwe deng dide. Gelek stranbêj, hozan û komên mûzîkê li vê cîhana estetîk derketin; albûm, konser û xebatên cihereng li darxistin. Herkes dîtyarê vê yekê ye. Wekî mînakên tîna zanîn; xweşgotinên “*Dîsa Dîsa*”, di sînorên Anatoliya Navîn hilnehatin



û xwe gihandin welatê bav û kolan. Bi ser de, ew gotinan demekê bûbûn slogan jî! Gula Momê, êdî bû gula welat! Ji bilî hunermendên Kurdên Anatoliya Navîn, hozanên wekî Şivan Perwer û Dîyar, mûzîka vê herêmê di meşka zanist û nûjeniyê de dikewînin. Bi raya min, ew di mûzîka Kurdên Anatoliya Navîn de serkeftineke girîng e. Mûzîka herêma me, xwedî stîleke serbixwe ye. Di cîhana mûzîkê de dikare bibe rengêkî cûda. Bêgûman, di vî warî de kar û xebatên bingehîn û cûrbecûr pêwîst in.

Koma Xelikan, ew çend sal in xebateke wêrek û bêrawestan dike û mûzîka herêma me bi stîl û şêwazeke hemdemî ji nû ve bi me dide naskirin. Di serî de bibêjim ku karê wan karekî pîroz û watedar



e. Li vê herêma jibîrbûyî û li qeraxa tunebûnê mayî, kar û xebatên bi vî rengî gelek dijwar in. Rê û rêçikên vî karî ji kend û kospan dagirtine. Bîr û baweriyeyeke kûr, sebr û arameke xurt berî her tiştî divê hebin. Birêxistinbûn û sazîbûn bila li aliyekî bisekine, tecrûbe û mînakên ku jê fêde bigirî gelek hindik û kêr in. Di deryayeye bêdeng û lal de, divê tu bibî qêrîn û hawarek. Bêgûman ew yeka bi zor û zehmet e. Lewma, karê ku ew dikin karekî pîroz e. Tistên pîroz, malê civakê ne. Asta herî bilind a nîrxên civakê pîrozî ye. Koma Xelikan, li vî cihê pîroz, berpirsariyeye giran hildaye ser milê xwe.

Niha bi albûma li ser navê “*Nalîn*”, meşa wan didome. Albûm, ji aliyê Kom Mûzîkê ve hatiye derxistin. Mirov zû tê derdixîne ku di albûmê de qalîteyek

heye. Ew li ser dewlemendiyeke mûzîkal hatiye raxistin. Ew yeka bala mirov zû dikişîne. Lê jê bêhna terza komên mûzîkê yên NÇM jî tê. Ne wek kêmasî, lê wek şibînekê bala min kişand. Her weha amûrên cûrbecûr hatine bikaranîn. Li kîjan amûrê bigerî, ew tê de heye! Vê yekê jî tahmeke xweşik, rengkî jîndar dayê albûmê. Bi dîtîna û ramana min, kompozîsyona ku hatiye xwestin, ango “*Nalîn*”, bi awayekî serfiraz derketiye holê. Xuya ye ku xebateke dirêj û girîng li ser hatiye kirin.

Hilbijartina berheman, ango stranên bi awayekî hûrnêrînî hatiye kirin. Gava ku mirov albûmê jî pêşî heta paşî guhdarî dike, tu dibê qey straneke tenê tu guhdarî dikî! Bi gotineke din, stranên di albûmê de li hev hatine, encameke watedar û balkêş ketiye ber destî guhdaran. Stranên “*Roj reş e*”, “*Ez î kal im*”, “*Lê narîne*”, “*Ez ne din im*” “*Kîngê hati*” wek berhemên Komê bi xwe di albûmê de cih girtine. Bi ya min, divê di albûmekê de taybetiyeyeke wisa jî hebe. Ango ger ku afrînerî, di xebatekê de nebû, ew xebata temendirêj nabe. Koma Xelikan, li hêla berhevkarî

û şîrovekariyê, afrînerîyeke profesyonelî jî dike. Stranan diafrîne! Ew yeka serfiraziyeke Komê ye. Gotin û mûzîkên wan stranan pir bi kêr bûne. Bi taybetî kilama "Roj res e", gelek xweş bûye. Helbesta li ser navê "Ez ne dîn im" ku rêzdar Mem Xelîkan nivîsandîye, bi tahmeke din e. "...emrê min xewneke şeva / ez î kal im tu stû xwar...", ew gotinan bala mirov dikisînin. Li vir zimanê Kurdî, tu dibê qey li ber îmgeyan serî hildide! Strana "Eman Elo", serkeftineke mûzîkalî ye bi ya min. "Zewik", "Yar Meke", "Kingê Hati", xweş hatine girêdan, li sîwana Nalînê dinalin. Her weha mûzîkjenê me yê hêja Bîlal Ercan bi dengê xwe yê dilşewat tevlê nalînê bûye. Wekî din bi du berheman hunermendê herêma me yê navdar Kürt Remzî hatiye bîranîn. Ji Tahsîn Taha yê nemir jî "Xwîna Dila" hatiye gotin. Bi vê yekê Koma Xelîkan, karekî wêrekî dike û xwe li cîhana mûzîkê wek namzetekî cîdî dide nasandin. Li vir dixwazim tistekî kin bibêjim, bi raya min Koma Xelîkan ber bi komeke neteweyîbûyî ve diçe. Guhdar û hezkirên wê ne tenê ji herêma me, bawer dikim ku ji çar

alîyên welat wê hene. Bi vê albûma dawî, ev yek wê hîn nêzîktir bibe!

Li alîyê din, dîzayna bergê û dîmenên di naverokê de li "Nalîn" ê hatine. Di nivîsandina gotinan de, pir caran çewtî hatiye kirin. Ne tenê albûma Koma Xelîkan, di gelek albûmên kurdî de ev pirs-girêka hîn berdewam dike. Ji bilî vê yekê, li bin her berhemê çavkanî bi awayekî zelal hatine diyar kirin. Ew yeka mirov agahdar jî dike.

Dawiya dawîn, albûma Koma Xelîkan a li ser navê "Nalîn", li ser axa Kurdên Anatoliya Navîn nalîneke din e. Bi fikr û ramana min, raborî û îroya Kurdên Anatoliyê, ango hest û hesreta sûrgûnî, bi awayekî estetîk hatiye ziman. Hêvîdar û bawer im ku em ê gelek salan behsa vê albûmê bikin. Ji ber ku giyan û naveroka wê bi bingeheke xurt hatiye danîn. Berhemeke jî dil û can, bi kedêke mezin û hêja derketiye holê. Ji bilî kêmasiyên biçûk, serkeftineke berbiçav heye û êdî dilê me bi nalîna Koma Xelîkan bihese! Di serî de endamên komê û kedkarên din ên vê berhema hêja pîroz dikim. Bila dil û dengê we sax be!....

RÛKENÎYA PARSEG

NUH ATEŞ

Komek xortên cahîl kuçikên mehelê li xwe gihandibûn hev û ew kişe parseg dikirin. Dengê kişe kişa xortan û ewte ewta kuçikan li sûk û meydanan bilind û belav dibû.

Kî dizana va cara çenda bû ku kuçik dihatin parseg yê ku ji hêla xwe ji kuçikan pareztinê da hûkirî û bi tecrûbe bû. Koma xortan û kerîyê kuçikan li pêy û tûrê parsegîyê li ser mil, wî bi şiva xwe ya ku bi dirêjîyê veqasî bejnemêrekî bû, xwe diparêzt. Wî şiv bi destê rastê, ji hêla rastê da berbi ya çepê weng ba dikir, te yê bigota, ew î paş xwe tirpan dikê. Bi vî awayî kuçik veqasî du, sê gavan ji wî dût diman û ne diwêrîn ku herin ser. Tu nîşanên tirsê li wî xuya ne dikirin; ew rehet û bi gavên giran bi rê diçû.

Bi rê da, parseg raste kalekî hat. Kal li ber dîwarekî rûniştibû û bi berxweketî xuya dikir. Parseg hat li ber wî dawestî. Bi dawestîna wî va,

xort û kuçikên li pêy wî jî dawestîn û bê deng man. Kuçik çend gavan dûtî wî bi şikleke xelqekî ketin. Xort jî li hêla wan li ser çokan rûniştin, te yê bigota ew ê guh didine ser sohbeta parseg û kalê yan jî wana navberekê dayîne şerê xwe û parseg.

Parseg bi rûyekî bi ken ji kalê ra got, “Xalo, çaxa te bi xêr be! Va çi hal e, tu çima veqas bi xwe da ketiyî, ma çi bûye, dunyê xera bûye?” Kalê serê xwe berbi jor helna û got, “...qet pirs meke, derdê min derdekî giran e, î mîna barê sêwîyan e!...Berê ez zengînê vî gundî bûm û bi min ra digotin, “mîrê gewrikan”. Yên mîna te ne diwêrîn ku di hêla min ra derbas bibin û silavekê bidin min. Niha jî, tu kesî kiriya xwe nakê ku bi min ra deng bike. Ez î bi hewêsa silavekê mame. Çi bû, ji avrûyên jinikê da bû. Ez ji dereke neçê zewicîm. Zarokin li min pêyde bûn, Xwedê wana neke derîyê dijminan, yek ji yekî hêvatir bû. Wana tu

kar ne kirin, bi ser da jî, bi diz û xûmarbazan va bûne heval, her yekî jî hêla xwe da mal û milkê min dizîn û talan kirin. Devê şore ye, wana text û tacê min wergerandin û ez bi dev û rûyan gihandim erdê.... ez mam li ber dîwaran...!”

Kalê kûrkeserek kişand û dû ra li rûyê parseg mêz kir û got, “ halê te jî ne tu hal e, lê ez î mêz dikime, dîsa jî rûyê te bi ken e. Min fehm ne kir, sirra vê çi ye?” Parseg li kalê vegerand û got, “vê seetê kewaniya vê malê han, kodikek heta dêv tijî genim da min. Ez pê şabûm û min hezar dua lê kirin. Rûkenîya min jî wê da tê. Aniha jî, ku min guh da ser hekata wergerîna text û tacê te, çi derewan bikim, ez careke din şabûm. Tu ye jî bibêjî çima? Min ji xwe bi xwe ra got, “ a Xwedê ye, ku ez ne bûme xwedîyê text û tac. Eger hebûya text û tacê min, guman dê hebûya ku min ew wenda bikirana û hîngê ez ê biketama halê te...!”

Kalê serê xwe kire ber xwe û bê deng ma. Wî di ber xwe da, bi piltepilt got, “çavê dewlemendîyê jî û yên xizanîyê jî kwîr bibin!”

Parseg xatir xwazt û dev da rê. Xort û kuçik di hevra bûn û dana dîyê wî. Kişê kiş xortan û ewte ewta kuçikan dîsa li sûk û meydanan bilind û belav bûn.

Serrastkirin û lêborînek

Di hejmar 30î de bi çewtî navê Mem Xelîkan li ser makala Nuh Atêş a bi sernivîsa *Destbiratî û xwînbiratî* hatibû nivisîn. Em li wir jî herdûyan lêborîna xwe dixwezîn.

Ev helbesta birêz Mem Xelîkan jî ber xetayên rastnivisînê, em careka din diweşînin.

Redeksiyon

XWAZÎ

ji Sefo're

Îşev dîsa hîv

Li ezmana çiqas xwaş e

Meriv şerxoş dîke

Dixwaze bi yarê ve

Li bin bimeşe

Xwazî tu jî hebî

Li Çiyayên Înê Gewr

Taldî zinarekî li

Kêleka min bî

Tijî xwe bikişîninî

Hundirê xwe

Wê hewê

Yek jî

Xwaş xwaş

Guh bi serdimî

Qebe qeba kewê.

MEM XELÎKAN

TECRUBEYA HEVALTIYEKÊ

STEFAN BUSZ

“Der Landbote”, 20.01.2006

Nivîskar Yusuf Yeşiloz di filmê xwe yê nû da, qala binecîbûna li xeribîyê, li Wînterturê (îswîcre) dikê.

Du sala di ber vê, Yusuf Yeşiloz yê ku sala 1964 an li Tirkîyê hatiye dinyê û îro li Wînterturê nivîskar e, filmê xwe yê yêkan ê dokumenter, di rojên filma li Solothurn dabû nasîn. Di “li hember dîwaran xwebirçî hîştin” da, rê ji coxrafyake bi xof diçû îswîcre û nîgarekî (resimekî) wengna dihata nîşandan: Li Tirkîyê êşkence, li wir bihûşteke (cenet) fani. Bi filmê xwe yê duduyan, “Di navbera dunyan da” Yeşiloz gaveke din çûye; ew dîsa bi forma dokumenter û xwe paşva hîştî, tarîxa jîyîna Gulî Doganê kat dike. Gulî hîn ku zarok bûye ji gundekî Tirk ê li çiyê hatiye Wînterturê û demeke

dirêj li wir, hem wekî Tirk, hem jî wekî îswîcreyî, xwe xerîb hîs kiriye. Îro ew jina ku temenê wê 35 sal e, di daîreya nifusê ya Wînterturê da, kar dike.

“*Di navbera dunyan da*” filmekî li ser xatirxastinîya ji zaroktîyekê ye û birîkiriya vegeerîne jî tê da ye. Di ber gîyan, ew filmekî li ser îro û nihaya li Wînterturê ye. Tecrubeya hevaltîyê jî her dem parek ji vê bextîyarîya li wir bûyîne ye. “klama barkirinê, hinek wê baş jî distrên” dibêje Yusuf Yeşiloz di pêşsêra (premîera) filmê xwe da li Solothurnê û dide ser, “lê hinek jî meneya wê nizanin.” Yeşiloz di filimê xwe da, cîh nade peyvên yad, ew sade dide nimandin, ku li ser rêyên xwe bûyîn tê çî mene ye û ji bo vê, bi piştgirtîya Dieter Greinîcher û kemerevan Hansuelî

Schenkel nîgarên lêhatî dibîne. Tenê guh dan ser

Ji ber ku Yusuf Yeşiloz bi hatina xwe, wekî ku ew di hekatên xwe yên bi navê, “mîvanê ji borîya zobê” (2002) û “îmam û manker” da kat dike, wekî rejîsor jî katbêjekî baş e. Ji ber ku ew xwediyê jêhatîya guhdarkirinê ye, fersendê dide merivan ên ku ew portreya wan nîşan dide, da ku ew bikanin kat kin.

Aha li wir, keçik bi bîranîyên xwe yên bi bavê va. Di pêşî da, ew bi wê xerîb dihat. Li Wînterturê wî wekî berê, wexta ku li tetilê diçû Tirkîyê, dîyarî ne dida. Bavê di ber gîyan piştgirtîya lawan dikir û omdîya xwe kiribû wana. Paşê, ew bi keça xwe serbilind dibû. “Ji mêzkirinê li wê carna qet têr nedibû” Gulîyê digot ku “keçika wî, mihecîra gund, niha li vir, di sazîyeke resmî da, li paş dîvanê rûniştîye û ji dewletê ra kar dike.”

Sehneyek jî, hevala wê Sandy Burî ye. Li dibistanê (mektewê) wê carekê li gerekê bi destê wê girtibû, ji wê pêçê da, her du bûne heval, di demên baş û dijwar da. “Eger Sandy ne ketiba jîyana min, ez a di mentelîta xwe ya ku min bi xwe ra anîbû, bimama” Gulî digot.

Ji fiyaskoyê heta hezkirinê

Ne tenê her du dunya, navbera wana her tişt e. Di saya rasthatina

bi jina îswîcreyî va da, di filim da weng tê nîşandan, vegeerîna li kultura xwe mimkun dibe. Zewaca pêşî ya bi pismamê xwe va û bi destê bavê hatibû pê, bû fiyasko. Zewaca wan neçû sêrî, ew ji ji hev cihê bûn. Gavekê şûn da, Gulî cara duduya disa bi mêrê xwe yê berê va, lê vê cara li ser binyata hezkirinê zewicî. “Me her duyan xwe guhêribû” Gulî digot.

Entegrasyon ew e ku meriv tim û tim, ji nû va li kultura xwe (dîne xwe jî) vegere. “Di navbera dunyan da” kêrparek e ji fehmkirineke bi vî awayî ra. Hevdîtina bi xwenga mezin va, di mala dayikê da, sehneya herî baştir a filimê ye. Cara pêşî, du sala berî vê, wana dîsa hevdu dîtibûn. Xweng hatibû serdana gund. Ji vê serdanê, wê nîgar bi xwe ra anîbû. Di wana da, xanîyên helweşî, gora bavê jî û çîya û ezmanê bilind xuya dikirin. Gulî Dogan li nîgaran sêr dike û çavbigîrî dibe. Rojeke ne dîyar, ew a bi zarokên xwe yên ku tenê Wînterturê nas dikin va here wira û wê derê bi wan binimîne. Ew dera, li navbera dunya ye û dikane li her derê be!

Nuh Ateş ew nivîsa ji zimanê elmani wegerandiyê ser zimanê kurdî.



Bi Ahmed Gezer re li ser komela gundê Altilera hevpeyivînek

Dema meriv wan salên dawî dinêre, em dibînin di nav kurdên Anatoliyê de tevgerêka bi rêxistinî dest pê kiriye. Di nav wê tevgerê de navê gundê Altilera jî pir tê bihîstin. Birêz Ahmet, tu dikarî dîtînen xwe li ser vê ji me re bêjî?

– Kurdên Anatoliya Navîn di nav tevger û rexistinên bi vê awayî de ne. Çend sedemên wê hene. Yek ji wan bi dîtina min, ev kurdên ji Anatoliya Navîn ku polîtîze bûne, li pirsgerêkên xwe, xwedî derdikevin. Dewlet naxweze alîkariya wan bike.

Bi giştî tevgerên kurda rolekî se-reke dilîzin. Li welatê xeribiyê yên ku ji navçe û gundê xwe re alîkarî bikin gelek in. Derfetên li Avropa ji alî aborî de zêde ne. Em dibînin merivên ku di nav kar û barê bi wî awayê de, piranîyên wan di nav tevger û rexistinan de xebitîne. Pêwîst e alîkariyê ji navçe û gundê xwe re bikin, ew ji bi tevger û rexistinan dibê.

Di destpêka avakirina waqfê de dîtînen gundiyên we çi bûn?

– Dîtînen gundiyên me cur bi cur bûn. Li Avropa avakirina komelê ji waqfê hêsantir e. Ji ber vê jî yê gundê me forma komelê hibijart.

Hewce ye ez vê jî bêjim; di avakirina komela Altilerê de xêrî min pir kesên din jî bo avakirina xebat kirin û hîn ji dixebitin.

Dema ku me ji gundiyên xwe re qal dikir, wan bi giştî digotin; fikreke baş e. Em amade ne piştgirîya vê yekê bikin.

Ji dîrwa me dibîst ku dibên wa kesena ji bo xatrê kurd û kurdîyatîyê dikin. Bi vî awayî xwe bidin isbat kirin. Li alî din jî kesek tû tiştêkî nake. Ya ku tim tînin ziman, kî dê rêvebirîyê vê bike? Em dikarin bêjin, ew bi tewayî bê hêwî û bê bawerîya xwe nişan didin. Ew fên û findên ku li Tirkîyê dibin ji alî pera de, nimûneyên ne baş ku li navçe û gundên me qewîmîne, em bixwezî nexwe-



Gundê Altîlera

Foto: Altun Başaran

zin, meriyan dikin bêgumanîyê. Ji ber wê me rêzname (destûr/tüzük) ji du mixtaran re, li Avrupa ji nêzikî 10-15 kesan re şand. Xêrî ji vê, li daweta, li şîna û şahiya, li festîval û newroza, me kî didît me jê re qala vê rêzname dikir. Dema ku em duçine îznê jî, me li her cihêkî dianî ziman. Ji dûwa li Almanya roja 22.01.2006, li bajarê Limburgê me civînek çekir. Nêzikî 35-40 kes tevê bûn. Li Avrupa ji gundekî 40 kesî binî cem hevdu, temsîlekê piranî ye, me biryar girt ku li Almanya bi navê Altîlera komelekê vekin.

Di programa we ya salane de çi heye. Wek destpêk hûn dê çawa xebata waqfê bidin nasandin?

–Di programa me ya îsal de, serîlêdana karê birokratîk ji bo komelê, li Almanyê heye. Endam berhevkerin, xercê endamdayî ne. Ya dawî me biryar girt ku li Almanyê, li bajarê

Kolnê, di roja 04. 11. 2006 de (Halay Dügün Salonu) bi navê Altîlera şeveke şenahiyê çekin. Bi vê em komelan, medyayê, nas, şexis, bi tevayî her kesekî daweta şeva Altîlera dikîn.

Dema em bala xwe didin destûr û xebatên ku têne kirin, em dibînin ku pirê caran karên ku divê berpirsiyariya îdareya gundan de bin, wan komelan û waqîfan ji xwe re kirine armanc. Di rewşa normal de divê armanc, parastin û pêşxistina çand û zimanê dayîkê be. Hûn li ser wê çi difikirin? Xebatek weng we daye ber xwe an na?

– Rast e, şert û mecal îro ev in. Ji ber vê zêde nikarin tişteki din bikin.

Li Avrupa meriv dikare zimanê dayîkê wek perwerdeyî bibîne, Kurdên Anatolîyê ji sedî çend kurîke xwe dişînin zimanê kurdî? Ez bawer nakim ji sedî yek ji be.

Desthêlatdar nahêlin komele kare-



Dîmenek ji Altılerâ

Foto: Ahmed Gezer

kî weng bike. Li alî din em rastîyekî ji bînin ber çavan, gundên Anatoliyê hîn negihîştine vê qonaxê. Rewşa kurda li Tirkîyê rewşeke normal nîne, li holê ye. Pêwîst e merc jî gihîştî bin.

Ji bo ku zimanê kurdî bêt parastin bi ya we divê ev rêxistinana çî bikin?

– Komele û waqif dikarin ji bo parastin û pêşxistinê çand û zimanê dayîkê program, çalekî, civîn û girîngiya wê binîn zimên. Hewce ye, sazîyên kurdên Anatoliyê bi hev re bixebitin.

Tekîliya we bi komele an waqfên ji gundên cîran re çawa ye?

– Tekîliya me bi komele û waqfên re yek bi yek nîne. Vê gavê em di nav avakirinê da ne, me hîn teva nekirîye. Lê em jî nêzik va dişopînin. Ez bi xwe jî di nav redaksiyona ko-

vara Vegerê de me. Ji ber vê komele û waqifên Kurdên Anatoliya Navîn jî nêzik ve mêze dikim.

Mesajek we ku hûn dixwazin bi rêya kovara Bîrnebûne bidin hebe, fermo?

– Mesaja min ev e. Parastina çand û zimanê dayîkê pîroz, di hûndirê malê de destpêdike. Meriv bi zimanekî deng kir, çand û jiyana wî mîletî jî hû dike. Yek dest, bi tenê deng nade. Hewceyîya pir destan heye ku deng bide. Ev xebata jî bi tevger û rexistinî dibe.

Di karê we de serkeftine dixwazim. Bi navê gundê Altılerâ ez spasiya we dikim ku we komela gundê me da nasandin.

Mala we ava! Her serkeftî bin!

Amadekar: ALI ÇİFTÇI

EZÊ KOÇKIM

MEM XELÎKAN

Ez nasekinim
Koçkim ji wira
Bihna xweliyê min dikişîne
Xweliya qundaxa min
Ezê koçkim
Herim gundê bav û bra

Herim axa xwe
Axa qundaxa min û te
Xelikên li dawetan
Govend bi çar alîya digerî
Di dest zirnevan de
Zirne ji nalîna lâl bûyî
Dahol bi zinge zingê kerr bûyî

Piştaxwe bidim
Palên çiyayên wî
Xema ji dil dûrxim
Xeyalên xwe bijîm
Li şevên hîvronahî.

Nênik, Hezretî Musa, Xaltê Eş

REBENÎ CELIKAN

"Nênik"Orta Anadolu Kürtleri arasında "Ayna" anlamında kullanılan bir kelimedir. Kürtçe'de "ayna" anlamına gelebilen birkaç kelime vardır aslında "awêne", "hêlî" ve kullanımı en yaygın olan "Mirêk". Fakat yöre Kürtleri arasında çoğunlukla "Nênik" veya "Neynik" denir "Ayna"ya.

Peki ama nereden geliyor bu kelime? Ayna'ya "Nênik" denmesinin sebebi nedir? Açıkçası bu soruların bir cevabı olabileceğini düşünmüyor "Nênik" kelimesinin olsa olsa Kürdistan'da bunun yerine kullanılan "Mirêk" kelimesinin ses değişimine uğramış, bozulmuş hali olabileceğini düşünüyordum.

Ta ki yaşlı bir teyzeden, Xaltê Eş'ten şu öyküyü dinleyene kadar;

" Hezretî Musa çû Misrê, mehes kir ku sîhrbazê Misrê yê erdê di şeklê mara da radikoline. Paşê bi dizikî di bin cilê xwe ra -NÊNİKÊ -di erdê da ber didine. Nênikê mîna mara xay dike. Yê veng xelkê dixapînîne. Hezret Musa va dî, li ber Xwudê gerî, çoyê xwe avêt erdê. Bi emrî Xwudê çoyê wî bû zîhayekî mara. Ew marên sîhrbaza yê derew-merew gî xwarin."

Hazreti Musa üzerine Tevrat'ta anlatılan bir söylencenin Kürtçe versiyonu idi Xaltê Eş'in anlattığı. Meşhur bir söylencedir bu, Hazreti Musa'nın Allahın yardımıyla Mısır sihirbazlarını nasıl altettiğini anlatan bir söylence. Fakat Xaltê Eş'in versiyonunda bir terslik vardı.

Anlaşılmaz bir nokta; "Nênik di erdê da berdidan " yani "Yere Nênik (ayna) döküyorlardı."

Xaltê Eş'ın bununla ne demek istediğini yıllar sonra, söylencenin orijinalini duyunca anladım. Buradaki Nênik, ayna anlamında değil "Cıva" anlamında kullanılıyordu.

Çünkü söylencenin orijinali şöyledir. "Hazreti Musa, Mısıra vardığında Mısır sihirbazlarının, yeri önceden bir yılan şeklinde kazıdıklarını, sonra insanların karşısında gizlice bu çukurlara, elbiselerinin altından cıva boşalttıklarını gördü. Çukurda akan cıva gerçek bir yılanmış gibi görünüyordu."


Yani Xaltê Eş burada "Nênik" kelimesini "ayna" anlamında değil "Cıva" anlamında kullanıyordu. Xaltê Eş Tevrat'ı okumuş muydu? Veya, Nênik'in cıva anlamına geldiğini biliyormuydu? Hiç sanmıyorum ama kesin olan birşey var ki oda Xaltê Eş bu söylenceyi bü-

yüklerinden duyduğu şekliyle anlatıyordu. Yani "Nênik" kelimesinin "cıva" anlamında kullanıldığı dönemlerde anlatıldığı şekliyle.

Peki ama "Nênik" "Cıva" anlamına geliyorduyorsa, neden bugün "Ayna" anlamında kullanılıyor? Bunu anlamakta pek zor değil. Çünkü eskidende, bugünde ayna yapımında cıva madeni kullanılır. Yani ayna yapılırken saydam bir camın bir yüzeyi cıva madeni ile sırlanır, böylelikle camın diğer yüzeyi ayna halini alır. Şöyle de denebilir; Ayna, cıvalı camdır. Yani "Camê bi Nênik"

Belkide kelime başta böyle kullanılıyordu "Camê bi Nênik". Bunu bilemeyiz ama yukardaki öyküde anlaşıldığı üzere başlangıçta bir madenin ismi olarak kullanılan "Nênik" kelimesi zaman içinde anlam kaymasına uğramış ve bugün bir nesnenin adı olarak karşımıza çıkmıştır.

AMERİKADAN KÜRT ALIŞAN BEYİN TORUNU ERAYBAR




Alev, anne ve babsıyla

Bîrnebûn`un sürekli takipçileri bilirler. Son 5-6 sayıda muhtelif defalar Orta Anadolu Kürtlerinin Mirimiranı Kürt Alişan Beyden bahsedilmişti. İşte taa Amerika`dan Alev Eraybar (Alex) bunları okuyup soyunun peşine düşmüş. Onunla Emaile olan yazışmalarımızı hiç dokunmadan ve değiştirmeden siz okuyucularımıza sunuyorum.

Bu mektuplar dahi gösteriyor ki, derginiz Bîrnebûn kökümüze ve geçmişimize yönelik nasıl ve ne kadar önemli bir rol oynuyor.

Alex Beyin yazdıklarından yola çıkarak şunu söyleyebiliyoruz. Alişan Bey Kürttür ve herhalukarda Ankara`da yaşamıştır. Alex Beyin babasının dedesinin adı Ahmet Necmi Bey`dir ve jandarma, asker kökenlidir. Alişan Beyin bir kızı ile evli olanda odur. Maalesef Alex (Alev) Bey ninesi olan Alişan beyin kızının adını hatırlamıyor. Bu bilgilerin bir boşanma sebebiyle kaybolduğunu belirtiyor.

Yine Alex Beyin babasının Dr Ziya Bey olduğunu anlıyoruz. Ve babasında 1960, Cemal Gürsel askeri darbesi esnasında Havacı General olan, Suat Eraybar olduğunu. Ailenin tamamına yakınının Üsküdar`da yaşayıp orada vefat ettiğini ve Üsküdar mezarlığında gömülü olduğunu da yazdıklarından anlıyoruz. Ayrıca General Suat Eraybar`ın DP yanlısı olduğunu da.



Alev, Leyla Tuncatö Denver 2005

Çeltikte yaşayan Alişan Beyin diğer torunlarında DP yanlıları ve 1960 Askeri darbesi onlara epey zarar veriyor. Atadıkları Nahiye Müdürü Kürt Alişan Bey ve ailesinin ,kızlarından Bostan Hanımın mezarlarını dahi kırıp, yok ediyor, aile ile ilgili eski tüm belgeleri de yok ediyor (Bak. Bîrnebûn. Ş.K ile olan Röportaj).

Ben Alev (Alex) Beyi Çeltik`teki Kökten ailesine sordum. Onlar ailenin İstanbul`a giden bir bölümünün olduğunu ve onlarla ilişkilerinin nesiller içinde tamamen koptuğunu söylediler. Yani ne Alex Beyi, ne de Suat Paşayı hatırlıyor ve tanıyorlar. Belki Çeltik`te Kaymakamlık yapmış olan Derviş Bey ve çocuklarının onları tanıyabileceklerini belirttiler.

Alex Bey, Emailinde babasının Kürtçeyi bildiğini belirtiyor. Bu da ailenin kürtlerle bağının kopmadığını ve de aslında Alişan Beyin kızının evlendirildiği Ahmet Necmi Bey`inde muhtemelen Kürt olabileceğini göstermez mi? Zaten o dönem tüm Orta Anadolu`daki Kürtlerin Miri Mirani olan Alişan Beyin, kızını rastgele birine vermeyeceğini takdir edersiniz. Şimdi Amerikalılaştırmış olan Kürt Alişan Beyin kızının torununun hikayesi beni çok heyecanlandırdı. Umarım sizlerde hoşlanırsınız.

DR MIKAILİ

Merhaba Dr Fikret Bey,

Ben Muhedsim, . Makine ve Senayi kisminda Iktisas ettim. Dunya capindaki kunpanyalarda Executive olarak calistim. My epertise has been make businesses be profitable. Simdi, emekliye ayrilmam lazim geldi, 25 sene evvel Mozambique, Africa' daki Projemde, fabrika kurarken grib olmustum , bana igne yaptilar, ates dusurmek icin. Fakat sadece kaynamis igneler Hepatitis "C" virusunu oldurmedigi icin ve o zamanlar HCV yi bilmediklerinden dolyi mikrobu aldım. ve 25 sene sonra kendini gosterdi. Simdi cok kuvvetli ilaclarla beni tedavi ediyorlar. Tib sahasinda hekimlik ettiginizden, siz Interferonlar hakkında anlarsiniz buna eminim. Ilaclarin yan tesirleri cok fena, fakat Amerikanin en mesur uzmanlari beni tedavi ediyorlar. Allah nasib ederse belki gelecek yaz Turkiyeye gidip ecdadim hakkında arastirma yapmak isterim. Interferons has to be kept refrigerated, boyle seyyahat zor olacak.

Ben Suat Pasanin ogluyum, babam kurmaydi ve Jet pilotu idi. Babamin babasi Dr Ziya bey, Dahiliyecı idi. Onun da babasi binbasi idi Askeriyede, he was artillery officer. Turkce mi coktan kaybettim kusuruma bakmayin gucluk cekiyorum ifade etmekte. Herne ise, babam Alisan Beyin kizinin torunudur. Babam alti lisan bilirdi, kurtce bildigi lisanlardan biri idi. Ben babam gibi lisanlarla gelismis bir insan degilim, evet babam Dunya capında bir adamdi. Hemen hemen yarım asir evvel, Turkiyede Lise talebesi olarak, edebiyat kitabında bir sairin siirleri dikkatimi cekmisti, ve begenmistim. Bu sahirin ismi Dertli idi, bu siirlerden birinde hatirladigima gore:

*Yuh harina debrin,
Gul'u gulzarina hem yuf,
Agyarina yuf
Yari cefakarina hem yuf*

Diyordu. Bunu babama okumustum. Babam "evet biz Dertliyi iyi biliriz, benim dedem, Alisan Bey, Dertlinin siirlerini severdi. Alisan Bey Dertliyi korumus ve bakmistir, koinagina bile musafir etmistir demisti. Iste o zaman Kurt Beyi Alisan bey hakkında isitmistim. Babam bu hussusta biraz daha konusmustu; bu konusmalardan Alisan Bey icin olan bir sevgiyi hissetmistim. Demekki, onun zevki benim zevkime uyuyordu, anladigima gore muazzam bir sahis mis. Anladigima gore Dertli Alisan Beyin konagında olmus.

Alisan Beyin konagi hala duruyormu diye sorusturdum, duruyor simdi İlk Okul olarak kullaniliyor diye isittim. Konaginın addressini arastirdim. Ankarada Samanpazarındadır, Yahudi Mahallesine yakindir dediler. Babam daha iyi bilirdi fakat o da vefat etti, fazla bu hususta konusamadik. Babam Kongoya davetli idi, President Mabutu'nun Military Advisorıydı. Isyancılar Celal Bayer ve Adnan Menderes

hukümetini yiktikten sonra babami da isinden attılar. 42 yasinda iki yildizli Pasa ve fevkalade Jet Pilotu olan babam, Alisan Beyin kizinin torunu issiz birakilmisti. Isyani yapanlar Komunistlerdi. Kongo Hukümeti babam hakkında isitmisler ve babami davet ettiler. Babam oraya gittigi zaman kirmizi halilar yayip Military Band ile kabul ettiler. Bu Alisan Beyin kizinin torunu icin degerli bir sey idi. Babami isinde attiktan sonra beni de Vatandasliktan attılar, ben Amerikada Univer-site talebesi idim.

Eger Ingilizce biliyorsaniz, kendimi Ingilizce olarak daha iyi ifade edebilirim. Babam yahut Alisan Bey capinda bir adam olamadim, artik yaslanmiya basliyorum fakat guzel bir siir, guzel bir sarki isitmek yahut ata binmek, kendi kotrami Denizde kullanmak ve guzel hanimlari begenmek bana hala zevk verir.

Kafi derecede tiras ettim.....

Hosca kalin,

Alev



Erol ve çocuklarıyla

Dr. Fikret Bey,

Sevki Kokle yapmiş oldugunuz interview 'u okudum ve çok begendim. Wealth of information var. Çok teşekkürler ederim. Size bir kaç resim attach ediyorum. 1954 senesinde Amerikaya gelmeden evvel çekilmiş resimimde rahmetli babamı ve annemi görmüş olacaksınız. Babam Alisan beyin kızının torunudur. İkinci resim küçük kızımın Law Degree aldığı zamanki (2005) seremoniyi gösterir. Bu resimde kardesim Tuncay Eraybar'I da görürsünüz. Tuncayın gencligi Bostan hanımın gencligini hatırlatır bana. Birde benim en büyük oğlum Erol ve onun, oğulları ile olan resmi var, Erol Columbus, Ohio'da yasar.

Hayat kuvvetli bir ruzgar gibi telas içinde geçti, ne ben nede Tuncay, simdilik babımın büyük annesinin ismini hatırlıya muyoruz. Acaba Alisan Beyin kaç kızı vardı? Alisan Bey ne tarihte doğmuş ve tarihte olmuş. Mezarındaki tarihler herhalde Hicri^ tarihlerdir. 1960 senesinde ahlaksız isyancıların Bostan Hanımın mezarını bile yok etmelerine ben çok uzucu buldum. 1960 daki Komünist Isyancılar da babamı alacağı ettiler ve beni de vatandaşlıktan attılar. Senelerce sonra Frankfurt'da Airport Hilton da kalıyordum ve Basvekil'in kardeşi Sevket Demirel Bey ile tanıştım . O zaman Sevket Bey'e güney doğu Türkiyede Petrol var demistim. Petrol mühendisi değilim fakat o bana asıkar. O zaman ben Ohio'da yaşıyordum ve benim evimin arka bahçesinde bile petrol kuyumuz vardı. O zaman Sevket'e eğer petrol aramıyacaksanız Araçlar ile su exchange yapın, suyu petrol'e karşı demistim. Size bedava Petrol versinler yoksa sularını kesin. Dicle ve Fırat nehirlerine büyük barajlar konması lazım dedim. Araçların sularını kesersiniz, siz petROLSUZ yaşıya bilirsiniz fakat onlar susuz yaşiyamazlar demistim. Ben bunu Diyarbakır'da 1953 senesinde düşünmüştüm. Sevket Demirel bana o isyancılar kim oluyorlar da seni vatandaşlıktan çıkardılar, gel beni gör, bunu düzeltiriz demisti. Türk vatandaşlığı benim için önemli olmadığı için bu hususta bir defa daha konuşmadım Türkiyeyi ziyaret etmedim di. Anladığıma göre Sevket Bey Dicle nehrine büyük bir baraj kodurmuş ve büyük Baraj'ın olduğu yerin iklimi bile inkisaf etmiş ve oralarda meyva ağaçları yetistiriyorlarmış diye ıssıtım. İnşallah doğrudur, böylece belki biraz tesirim olmuş oldu belki.

Simdilik hoşca kalın, we will continue with our dialog. Vermiş olduğunuz malumatlar beni çok sevindirdi teşekkürler ederim.

Tanrıya emanet Olun,

Alev

İÇ TOROSLAR'DA ALEVİ-KÜRT AŞİRETLERİ

MEHMET BAYRAK

Giriş: Satırbaşlarıyla Dulkadirli Beyliği'nden Günümüze İçtoroslar

